


Wênesaz Roşad Yûsif:

Kurdayetî û hûner bi hev re dikarin cihanê bihejînin



Samî Berbang
Tirkiye li Dadgeha
Ewrûpayê tê darizandin
Rûpel 3

Stenbol, Çukurova, Îzmîr
Dîsa 1 Gulan
bi xwînê sor bû..
Rûpel 6


A. Melik Firat
Cem Boyner heyf bû
xwe xerc kir..
Rûpel 13

NAVEROK



4

Eşq li Kurdistanê dest pê dike (3) – Gürdal Aksoy



10

Dijîtiyên di navbera Tirkiyeyê û Sûriyeyê de (2)



11

Stêrkên şevê – Düzgün Deniz

Ji Xwendevanan

BI derketina Azadiya Welat, ji bo welatekî azad û serfiraz gaveke girîng hate avêtin.

Ez ji xwendevanan re dibêjim, bidin xatirê Xwedê, hûn Azadiya Welat bi tenê nexwînin; bi malbata xwe, heta ku ji we were tevî cîranan bixwînin. Di mala xwe de û li derve çi qas em bi zîmanê xwe bipeyivin, emê ewqas zû serfiraz bibin. Lewre, xwedî li welat derketin, bi dûtina min serê pêşin li zîmanê xwe xwedî derketin e.

BERKEN BEREH/KOLIK

PÊŞVEÇÛNA teknolojiya navgînên ragihandinê derfetên gelekî mezin û girîng dide destê dijminên me. Ew ji van çekan ji bo parçebûna welatê me û pişaftina me bi şideteke mezin dixebitînin.

Bêguman ev ji bo me rewşeke bijehr e, jehrku jî ev e: di serî de çêkirina yekîtiya alfabeyê, dû re bibandorkirin û li welat belavkirina rojnameyên wekî Azadiya Welat, Nûbihar û hwd., saziyên wekî NÇM'ê, Enstîtuya Kurdî, MED-TV û rengên weşanên din.

Di vî warî de daxwaza min ji xebatkarên Azadiya Welat ew e ku der barê roj, mirov, bajar, çalaki û tiştên din ên girîng de berebaziye helbest, pexşanan saz bikin.

SADI ÇÖZGEN/MÛŞ

Gelş a me tevan e em jê nerevin



MEHMET GEMSİZ

Gelş û gelemşeyên me yên ku li hêviya helkîrîne ne, pir in. Kî bi çi warî re eleqedar be, ew bêhtir bi gelşên wî warî dizane û bi waş re rû bi rû ye. Serê çend salan e ku em jî, di warê weşan û çapemeniya bi kurdî de, dixebitîn.

Tecrûbeya van salan, bi me, gelşên me yên ku herî girîng in, dan hesandin. Niha, ji berê bêhtir em baş dizanin ku, pêwistiya me bi çi heye; ji bo çareyên dema pêşîn. Gelşên me yên ku li benda çareyên navîn û taliyê ne jî, hene.

Xwendevanên me jî dizanin, di 22'yê avrêlê de me bi panelekê Salvegera Roja Rojnamegeriya Kurdî pîroz kir. Bi hinceta vê rojê, em beşdar li ser gelşên ku di warê me de hene, sekinîn û ji bo çareyan jî hin pêşniyaz hatin kirin.

Min bi xwe pêşniyazek kir ku, ji weşanxane, kovar û rojnameyên ku bi kurdî çalakiyên weşanî dikin, komîsyonek bê sazîrin. Ew komîsyon jî, lê bixebite da ku standartek di warê nivîskî de pêk were.

Ji ber van sedeman min pêwist dît ku komîsyoneke wisa saz bibe:

Ji her kesî re eşkere ye ku gelê kurd sê

alfabe bi kar tîne. Li Rojhilat û Başûrê Mezin alfabe ya kurdî ya bi herfên erebî, li nav kurdên "Sovjeta berê" kirîlî, li Bakur û Başûrê Biçûk jî alfabe ya kurdî ya bi herfên latînî.

Divê ev jî bê gotin ku, li Moskovê jî rojnameyêke bi navê Axîna Welat derdikeve û alfabe ya kurdî ya bi herfên latînî bi kar tîne. Her wiha, hin nimûneyên din jî hene ku mirov dikare wan biawertîne (istisna bike).

Li başûrê welêt, li Silêmaniyê mamosteyekî bi navê Dilşad Merîwanî, ji ber ku alfabe ya kurdî ya bi herfên latînî hînî suxte û şagirtên xwe kiribû, hate îdamkirin. Ev bûyer di 13.3.1989'an de qewimî. Dilşad Merîwanî 42 salî bû.

Dagirkerên ku welatê me xistine bîndestê xwe, bi hemdê xwe tu car destûr nadin ku kurd alfabeke pişkdar (muşterek) bi kar bin. Nimûneya ku me li jorê ew pêşkêş kir, îspata vê yekê ye. Ji bilî alfabe, aloziyên di warê gramer, rastnivîs û devokan de em li dera hanê bihêlin.

Îcar, di nav me bakuriyan de jî gerramol heye. Standarteke qenc di navbera me de çênebûye. Ji bo pêkanîna zimane-

kî yekgirtî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di sala 1993'an de du civîn li dar xist. A pêşîn di 31'ê tîrmehê de û ya duyemîn jî di 21'ê gelawêjê de. Ji derdorên cihên cihê yên kurdan kes beşdar bûn. Her kesî raman û nêrînen xwe daxuyandin û derbarê guherîna herfên "i" û "î" yê bi "ı" û "i" yê de, ramanêke pişkdar derkete holê.

Ev sê sal qediya ku, em hê jî ji cihê neleqiyane. Lê tiştêk jî heye. Hêja ye ku em jê behs bikin. Bakurî çî li welêt, çî li Stenbolê û çî jî li Ewrûpayê du alfabeyan bi kar tînin. Hema em dikarin bibêjin hemû rêxistin, tevger, partî û şexs li aliyekî û derdorên rojnameyan Ronahî û Komkar li aliyekî. Bera pêşin di warê gramer, rastnivîs, devokê de hemen hemen wekî hev in, bera duyemîn jî alfabeke din, rastnivîseke din, gramereke din û devokeke din bi kar tîne.

Qesta min ji devokê ev e: Bera pêşin devoka Botan, bi gotineke din bilêvkirina (telafûza) Botan, a duyemîn jî ya Serhedê bi kar tîne.

Di dawiyê de jî ez dixwazim vebibêjim. Ji Ronahiye birêz Latîf Epözdemir jî, yek ji panelîstan bû ku diviyabû beşdarî panela "Roja Rojnamegeriya Kurdî" bibûya. Tevî Ahmet Zeki Okçuoğlu ew jî nehate panelê. Me dixwest ku em gelşên xwe yên pişkdar bi hev re, rû bi rû niqas bikin. Lê nebû.

Belê, em hîna nikarin gelşên xwe yên li Bakur saft bikin, em dê çawa karibin ji yên parçeyên din ên welêt behs bikin?

Mirovahî xwe nû dike

CEGERSOT BOTANÎ

Di dîrokê de tê zanîn ku welatê kurdan, di jiyana mirovahiyê de cihêkî girîng digire. Jiyana mirovahiyê li vî welatî dest pê dike; ji aliyê huner, çand û şarîstaniyê ve ev der bûye warê gelek pêşketinan.

Her wiha tê zanîn ku li ser vê axê zehf gelan jiyana xwe derbas kiriye û hemû tuxmên bawerî, olan li vir şax daye û domiye. Ev welatê hêja û şîrîn her dem, ji ber xweşî û girîngiya nîrxên sererê û bînerdê xwe bûye meydana şer û lêdanê. Pir gelên wekî ermen û asuriyan hatine qirkirin û hemû çeshên qirkirî li ser gelê kurd jî hatiye ceribandin û ew jî welatê xwe hatine koçberkirin. Hemû destkeftiyên wan û yên gelên din hatine talankirin û wêrankirin.

Belê tu caran nekarîne gelê kurd bi tevahî ji holê rakin û dawîya wan bin. Gelê kurd li hemberî zordestan û xwînmijan her dem li ber xwe daye, heta îro jiyana xwe berdewam kiriye.

Di dîrokê de dagirkerên Kurdistanê hemû deman dijberî û neyarî, dubendî xistiye navbera kurdan bi xwe û gelên din. Dem dem dubendî xistiye navbera kurdan û ermenan, kurdan û asuriyan. Gelek caran tê bihîstin ku dibêjin "kurdan alîkariya osmaniyan kirine; qira ermen û asuriyan anîne". Heta îro mixa-

Ev têkoşîna hemdem, têkoşîna ermen, asûr û gelên herêmê hemûyan e. Îro hêviya serxwebûn, azadî û wekhevîyê ji hemû deman nêzîktir e û rizgariya gelên Kurdistanê li çar aliyên dinyayê şax daye.

bin hin asûr û ermen jî vê gotinê qebûl dikin û dibêjin. Lê ev gotin ne di çarçoveyê zanistî û dîrokî de tê şîhênkirin (pîvan).

Belê dîrokê kifş e; tê zanîn ku qirkirina ermen û asuriyan di 1915'an de dest pê kiriye. Di wê demê de Osmanî dagirker û desthilatdarê Kurdistanê bûn. Ji bo parastina mafên xwe ji malbatên kurdan (ji êl û eşîrên xurt) hêzên Alayên Hemîdî pêk anîbûn. Li dijî serhildanên kurd û Kurdistanê jî dihatin bikaranîn.

Îro jî, li hemberî şoreşa Kurdistanê alayên ceşşan pêk anîne. Alayên Hemîdî wê wextê zordarî li kurdan bi xwe jî dikirin. Belê bi destê konevanî (politika) ya osmaniyan. Mixabin ew alayên ceşşan têkilî qirkirîne bûne. Wê rojê jî ceşşên kurdan, kurd, ermen û asurî dikuştin. Îro jî ev ceşşên wekî hemîdiyan kurdan dikujin û gundên wan disojin (şewitandin) û penaber dikin.

Ev qirkirina ku gotin li ser tê kirin, tê zanîn ku li rojhilatbaşûrê mezin û başûrê biçûkê Kurdistanê nehatiye kirin. Ev jî vê dide xuyakirin ku, ew bûyerên qirêjî û li dijî mirovatiyê, ne bi îradeya gelê kurd hatiye kirin. Di ser wan hemû

qirkirin û pêkutî û talankirinan re jî, di sa gelê Kurdistanê stûyên xwe li hemberî dijminên dagirker netewandin.

Îro mirovahî li vî welatî xwe nû dike. Tê zanîn ku gelek sal in li her parçeyê Kurdistanê berxwedan û şer heye. Berxwedan û şerê mezin yê hemdem nêzî bîst salan e li Bakur didome. Tirêja vî şerî dide tevî Rojhilata Navîn û cihê hanê.

Ev têkoşîn ne bes ya kurdan e. Ev têkoşîna hemdem, têkoşîna ermen, asûr û gelên herêmê hemûyan e. Îro jî hêviya serxwebûn û azadî û wekhevîyê ji hemû deman nêzîktir e. Xebat û çalakiyên rizgariya gelên Kurdistanê li çar aliyên dinyayê şax daye.

Rojeva îro jî li ser pîrsgirêka gelên Kurdistanê ne. Dem dema bilindkirina xebatê ye û yekîtiyê ye. Divê hemû kurd, ermen, asûr û hindikahiyên din ên li xaka Kurdistanê, dest bidin hev û bikevin nava vê karwana xelasbûnê.


Di vî warî de berpirsiyêke pir girîng dikeve ser milên karker, ronakbîr, mirovperwer û demokratên gelê tirk jî. Ji bo nûkirina mirovahiyê li vî welatê da yîkî. Peywira dîrokî dikeve ser mit hemû kesên azadîxwaz û mirovperwer



POLİSAN di pirozbahiyên 1'ê gulanê de dest danî ser rojnameya me û belavkarên me girtin binçav.

Li Mersînê bi îdiaya ku rojnameya me hatiye berhevkirin, dest danîn ser 67 rojnameyên me. Polîsên ku dest danîn ser Azadiya Welat, du belavkarên me yê bi navê Yusuf Ertur û Emin Özdemir binçav kirin.

Polîsan paşê hevalên me berdana, lê rojnameyên wan nedan. Li aliyê din, li Stenbolê jî bi eynî îdiayê polîsan dest danîn ser birek rojname û xwestine belavkarê me bigirin, lê rayedarên HADEP'a navçeyê Eminönü nehiştine.



CIGIRÊ SEROKÊ HADEP'ê û nivîskarê rojnameya me Osman Özçelik ji aliyê DGM'ya Enqereyê ve hate girtin. Roja 26'ê avrêlê Osman Özçelik bi mebesta îfadeyê çû DGM'ê, li wir hate girtin û ew şandin Girtîgeha Navendî ya Enqereyê.

Li gorî îdiaya dozger, Özçelik di daxuyaniyeke ku dabû çapemeniyê de, li dijî xala 169'an ya zagona cezayê tevgeriye. Yanê piştigiriya tevgereke çekdar kiriye. Lê, hiqûqzan diyar dikin ku daxuyanî li ser tevkujîya Basê bûye û şîroveyeke bi vî rengî ne rast e. Girtina Özçelik ji aliyê derdorên demokratîk ve hate rexnekirin û berdana wî hate xwestin.

NÛÇE

Tirkiye li Dadgeha Ewrûpayê tê darizandin

KHRP
Kurdish Human Rights Project

Rayedarên dewleta tirk diçin Ewrûpayê dibin demokrat. Hin kes vê yekê bi tesîra hewayê ve girê didin. Heke wisa be, hewayê Kurdistanê bandoreke ne baş li wan dike. Lewre ew diçin Ewrûpayê çî peymanê mafên mirovan hebe mor dikin, paşê tîr li Tirkiyeyê pê pesna xwe didin, dema diçin Kurdistanê jî bîr dikin.

Wekî tê zanîn rayedarên tirk di sala 1954'an de Peymana Konvansiyona Ewrûpayê mor kirine, di sala 1987'an de mafê serîlêdana şexsî daye welatîyên xwe. Li gorî peymanên ku wan bi ewrûpiyan re mor kirine, divê ji 24 saetan zêdetir kes di binçavan de nemîne, li Tirkiyeyê ev dem dibe 15 roj, li Kurdistanê ev dem bi mehan tê pîvandîn.

Zekî Aksoy jî wan kesên bêşans e ku li ser erdê kurdan ketiye destê hêzên tirk. Aksoy di 24'ê sarmaweza 1992'yan de li Mêrdînê tê girtin, li Emniyeta Mêrdînê îşkenceyên xedar li wî dikin. Her wekî vê bûyerê, metodên îşkenceyê jî ne biyan in ji kurdan re: lêdan, elektrîk, ava bitazyîk û hwd.

Piştî vê, di sala 1993'yan de bi alîkariya ÎHD û Projeya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KHRP) serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê dide. Lê dewletê nikare vê yekê daqurtîne, lewre jî Zekî Aksoy di sala 1994'an de bi destê hêzên kontrayî tê kuştin. Lê doza ku wî vekiribû, di 26'ê avrêla 1996'an de hate ber Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê û serê dewleta tirk xiste belayê.

Li aliyê din hêzên ARGK'ê diavêjin ser qereqolekê li gundê "Kelekçi"yê Amedê, li hemberî vê yekê hêzên dewletê di 10'ê sarmaweza 1992'yan de diçin ser gund û 9 malan tevî tiştên tê de, dişewitînin. Hêzên dewletê bi vê

Rayedarên tirk diçin li Ewrûpayê peymanên mafên mirovan mor dikin, tîr li Kurdistanê jî bîr dikin. Hin mirovên wekî Zekî Aksoy mirinê didin ber çavên xwe dozê lê vedikin, lê îcar jî dewlet sûcê xwe dixwe stûyê PKK'ê.

yekê namînin, dar û berê wan jî dişewitînin. Li ser vê yekê ew gundî jî serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê didin. Komîsyonê jî ber gelek xalan Tirkiye sûcdar dît û ew doz jî hewaleyî Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê kir. Di 25'ê avrêla 1996'an de dadgehê doza wan jî hilda dest.

Her çiqas her du doz hatibin taloqkirin jî, Tirkiye niha bersûcê dadgehê ye. Xalên ku Tirkiyeyê di bûyera Zekî Aksoy de bînpê kirine ev in: Azabûna ji îşkenceyan û kirinên nemirovî; azabûna ji binçaviyeke ji standartan dirêtir; pêkanîna mafên xwegihandina dozvekirinê li dadgehên hundir.

Dîsa di bûyera gundiyan Amedê de, dewlet jî ber van yekan tê darizandin:


Ji jiyana malbatî re hurmet nîşan nedaye; welatîyên xwe ji kirinên nemirovî neparastîye; rîya dozvekirinê nedaye welatîyên xwe û rê li ber serîlêdana li komîsyonê girtiye. Her wiha wê, mafê xwedanmaliya welatîyên xwe bînpê kiriye.

Rayedarên tirk li hemberî van îdiayan, xweparastîneke klasîk a bi vî awayî kirin:

Yekî PKK'yî jî ber kuştina Zekî Aksoy niha di girtîgehê de ye, malên gundiyan jî PKK'ê şewitandine.

Heke ew şerm nekin, wê bibêjin Zekî Aksoy bi xwe, xwe kuştîye û gundiyan jî bi xwe malên xwe şewitandine.

Li aliyê din nûnerên dewleta tirk di dadgehê de bi bîr xistin ku, divê riyên hiqûqî yê li hundir bîr kutakirin, piştî ku ew rê xitimîn mirov karin serî li



Kesên ku ji aliyê dewletê ve maxdûr bûne serî li saziyên navneteweyî jî didin û li mafên xwe digerin.

Komîsyona Ewrûpayê bidin.

Di rewşên normal de ev yek rast e. Lê her kes dizane ku li Kurdistanê rewşeke ne-asayî heye. Lewre jî dadgehê guh nade vê daxwaza parêzerên dewletê. Niha dewleta tirk jî ber mafên ku bi henekî dabûn welatîyên xwe, ketiye nava tengasiyeke mezin. Lewma ji bo ku rê li ber serîlêdana mirovan bigire, çî ji destê hêzên dewleta tirk tê dikin.

Ev rastî bi raporeke Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) hate tesdîqkirin. Li gorî vê raporê Tirkiye bi tehdîtan rê li ber welatîyên xwe digire, da ku ew serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê nedin. Rapor, bi 9 mînakên ku piraniya wan kurd in, nîşan dide ku, çî hatiye serê dozdarên HRW di vê rapora xwe ya ji 38 rûpelan de, hin tiştan pêşniyazî Tirkiyeyê dike.

Tê xwestin ku bi hinek bergiriyên bibandor rê li ber bînpêkirina xala 25'an a Konvansiyona Mafên Mirovan bê girtin. Ew xal jî bo parastina mafên mirovan û azadiyên bîngêhî hatîye amadekirin.

Ne bi tenê HRW û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê Tirkiyeyê tengazer dikin, Asambleya Parlemantoya

Ewrûpayê jî raporeke mebusê sosyalîst ê Macaristanê Andreas Barsony pejiwand. Di vê raporê de tê xwestin ku xala 8'an a Antî-terorê bê guhertin, 4 mebusên DEP'ê bîr berdana û pîrsgirêka kurdî bi rîya siyasî çareser bibe. Her wiha efûyeke giştî jî tê pêşniyazkirin. Dîsa tê xwestin ku hemû komîsyonên hiqûqî û yê mafên mirovan ên asambleyê, heyetên çavdêriyê bişînin Tirkiyeyê.

Li aliyê din Rêveberê Projeya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KHRP) Kerim Yıldız diyar kir ku, ew doz wê wekî mînak kar bikin. Piştî van dozan wê her kes karibe serî li komîsyonê bide. Yıldız bi bîr dixwe ku, ew doz bêyî ku prosesa hiqûqî ya hundirîn biqede rasterast hatine ber destê komîsyonê. Li gorî Yıldız, wê dozên bi vî rengî rê li ber guherînan vekin.

Di daxuyaniyeke KHRP'ê de tê diyarkirin ku, heta niha 54 dozên ku wan birine komîsyonê, hatine pejiwandin. Tê gotin ku 400 kesî bi rîya vê rêxistina însanî, serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê daye.

Eşq li Kurdistanê dest pê dike (3)

GÜRDAL AKSOY

Tê dîtîna ku hovebarên hemdem, ji gerîn û jiyîna tazî nerihet nedibûn. Lê belê, beramberî medeniyetê însan, xwe bi awayê 'nu' ditiye û laşê xwe zêdetir veşartîye û nuxumandîye. Bêguman, civakên berê şarezatîyê jî, hindik be jî heta radeyekê xwe dinuxumandin. Feqet, bi destpêkirin û pêşveçûna civakeke ku berî zewacê têkiliyên cinsî hema bêje nîn e û têkiliyên mulkiyetê têkiliyên cinsî tayîn dike, bivê nevé nuxumandin zêde bû. Li gorî gotîna Will Durant, "nuxumandin dema bû tiştekî ji xemlê wêdetir, heta cihekî, ji bo jîneke zewicî xizmeta statuya dilsoziyê (sadakat), heta cihekî jî, ji bo ku form û xweşikahiyê bêhtir derxe holê, hate bikaranîn." (43)

Tê dîtîna ku, fikra namûs û dilsoziyê ku mulkzanîna cinsî ye û beramberî medeniyetê derketîye holê, nuxumandin xistiye dirûvê fazîletê. Di vî warî de nêzîktêdayîna herî hişk jî, di Serdema Navîn de rû daye. Di vê demê de, cil û bergên girtî û deriyên girtî jî bes nehatiye dîtîna, civaka mējîyê mēranî, kembera qîzaniyê îcad kirîye. Di vê dema ku kembera qîzaniyê hebû de jî, eşq hatiye merhaleya xwe ya herî bilind.

Dinyaya nependîkirî, hişmendiyê (bilinç) jî vedişêre. Dinyaya hemdem jî, dinyayek e ku her diçe nependiyê zêde dike û hişmendiyê jî şêlo dike. Di vê rewşa hişmendîya şêlobûyî de, fikirîna neçewtî mimkun e gelo? Eşq jî, yek ji van çewtîyan e. Ji ber vê yekê eşq, di vê maneyê de zanîn nîn e, berevajiyê wê, çewtîyek e û çesneke "bawerî"yê ye; bi awayekî xwe mecbûrdîtin e.

Madem wisa ye, Adem û Hawa, bi xwarina ji dara sêvê, ku mîna dara agahiyê jî tê qebûlîkirin, çi dizanin? Li vê derê "zanîn" tê kîjan maneyan?

Carekê Adem û Hawa, bi xwarina sêvê, baş û xerabiyê jî hev derdixin, bi awayekî din digihîjin zanîna jihevderxistina xweşik û nexweşikbûnê. Ne tenê ev; digihîjin hişyariya cinsiyetiyê jî. Enteresan e, di îbrânî û grekiya kevn de, peyva "zanîn", di eynî demê de tê maneya têkiliyanîna cinsî jî. Her wiha di Încîlê de, "Îbrahîm jina xwe **zanî** û ew bi hemlema", tê nivîsandin (44). Ev bi vî awayî dikare bê şîrovekirin: Şarezatîyê, di babeta cinsiyetê de, hem ferqiyeta fizîkî hem jî ferqiyeta hîsî dixwe navbera însanan. Ji xeynî vê jî, ji van ferqiyetan dinyayeke nependî çêdike û dinyayeke efsûnkirî difirîne. Di vê niqteyê de rastî, bi awayekî rast nayê fêmkirin, hiş şêlo dibe û ji vî hişê şêlo jî, şaşbûneke girîng yanê eşq diwelide. Jehrkujê (panzehir) we şêlobûna hiş jî, bi cinsê li hemberî xwe re bi awayekî cinsî têkiliya fizîkî û hîsî danîn e. Bi taybetî jî, têkiliyeke xwerû cinsî. Çunkî, têkiliyeke bi vî rengî şêlobûna hiş jî holê radike û bi awayekî ku maneya vê peyvê ya etîmolojîk jî bihundirîne, jin mēran, mēr jî jinan dizanin. Her çiqas, ji tiştekî dûrbûn an jî dûrmayîn dibe sebeb ku ew tişt zêde neyê zanîn jî, peyva "zanîn" a di grekî û îbraniya kevn de, bi rastî jî ez naxwazim tenê bi vê maneyê, bi sînor bikim. Maneyeke din jî beramberî ezebiyê, ji zaroktiyê ber bi ezebiyê ye; ji ber vê



Wêne: M. Deljoğlu

yekê jî, wisa bawer dikim ku di eynî demê de jiyaneke bêhtir bi zanebûn û gava ku ber bi cinsiyetiyê tê avêtin e. Ji ber ku di vê demê de, şexs kêm zêde nasnameya xwe wê nas bike û di vê navê de wê bigihîje zanebûna têkiliya cinsî...

Em werin ser rola mar a di bexçeyê cenetê de...

Di mîtolojiyê de, mar jî erotîzm û cinsiyetiyê îfade dike. Çunkî li gorî ku tê nîşandan mar, bi awayekî şeklî hemen fikra **fallus** tîne bîrê; awayê daqurtînok (yutucu) jî orxana mēyîtiyê dide fikirandin (45). Ku gerek bike çend heb mînak were dayîn; li Erebiyê berî îslamiyê Xwedê Was, hem bi eşqê re hem jî bi mar re dihat peywendîkirin. Dîsa, Fîniyan yezdanê xerabiyê (evil) mîna patro-nîyê eşqê dihesibandin. Evqas jî nîn e; li gorî ku A.E. Crawley dide nîşan ku mar, di her gotegotê de ku bi koka eşqê ve eleqedar e, cih digire (46).

Sebebeke peywendîkirina mar a bi erotîzm û eşqê re; di fikra mîtîk de mar, bi heyvê re tê peywendîkirin. "Îşareta ezmanî a mar", li gorî Campbell ku nîşan dide, "Ewê ku mezin dibe û vedimire, şeklê xwe jî holê radike û cardin mezin dibe, heyv e. Heyv pîvan û îlahî rahîm e ku wê rîtma jiyane diafirîne; jîndar tevî wê di eynî wextê de tîn û diçin: Îlahî sîra mirîn û zayînê ye." (47). Heyv û mar dema tîn peywendîkirin, bi awayekî xwezayî regil (keçxwînî), zayîn û seks, mar tîne bîrê. Li ser vê yekê, dixwazim ji baweriyê ku di kevnepên mûsewîyan de cih digire, behs bikim. Tê gotin ku seba regilbûna Hawayê, bi marekî re, bi danîna têkiliya wê ya cinsî, derke-

tiye holê (48). Tabî ev mar jî, ji xeynî seytên ne tu kes e. Ku bi wî awayî bibe, têkiliya cinsî ya Hawayê bi mar re, li gorî mîtolojiyê em teyîd dikin. Ev jî dide nîşan ku, di mîtosê de (rastîbûna tarîxê bi awayekî şêlo radixe ber çavan) bavê me yê Adem, li ser cîhanê bi tabîreke amiyane kesê ku cara yekemîn tê xapandin e.

Di pergala civakî ya pederşahiye de (patriarkal) neviyên Adem ên kurik, wisa dixuye ku heyfa vê guneha yekemîn ji jinan zêdetir standine. Çunkî, mēran jî aliyekî ve bi fuhûşê (zêdetir fizîkî), ji aliyê din ve jî bi rîya eşqê (zêdetir hîsî) jin xapandine. Ev di eynî demê de tê maneya ku jin jî mēran dixapînin. Li ser vê yekê, li hemberî çanda pêkutiyê ya şaristanîyê ya li ser daxwaziyên cinsî, em dikarin bibêjin ku, du rîyên serhildanê cihê-reng an jî du şeweyên revînê yên cihê-reng derketine holê. Ji van yek eşq, ya din jî fuhûş e. Fuhûş, berevajiyê awayekî ku tê zanîn, ne "pişeya herî kevn a cîhanê" ye. Will Durant behs dike ku, "di gelek civakên hovebar de, beriya zewacê jiyana seksê di temeneke gelekî biçûk de dest pê dike", piştî wî jî dibêje ku, "ji ber vê yekê, fuhûş di civaka hovebar de ne belavbûyî bû", dû re jî ev li gotîna xwe zêde dike: "Di rastiyê de 'pişeya herî kevn' a cîhanê, zêdetir nû ye, ancax, piştî ku mulkiyet derdikeve holê û azadiya berî zewacê jî, wînda dibe, tevî şaristanîyê derketîye holê." (49). (abç).

Azadiya têkiliya cinsî ya berî zewacê, di pergala civakî ya mulkzanîna taybet de ji holê rabûye, ev jî, tevî jihevderxistina xweşikî û nexweşikbûnê, bûye se-

beb ku însan li gorî xwe çî xweşik dîtine berê xwe dane wî alî. Di vê halê neçariyê de di rîya îdealkirina arzûyên cinsî, însanê/a hemdem jî xwe re wext veqetandîye, tîpekî/e îdeal di serê xwe de afirandîye ku, ew kiriye mînakê eşqê. Lê belê, di civaka komunal de, ji ber ku keç û xortên ciwan ji bo ku hevûdu nas bikin û têkiliya cinsî bi hev ve deynin, festîwal û pîrozbahî çêdibûn, ne cih jî eşqê re, ne jî, ji fuhûşê re hebû. Dîsa jî ber vê sedemê, fetîşîzma ezebtîyê falan jî tune bû. Berevajî, li keçên ezeb bi çavekî nebaş dihat nihêrtin. Li gorî ku Durant diyar dike, "Li Malabarê, keç, ji kesên ku ji rê diborîn rica kirin ku ezebtîya wan xera bikin, 'ji ber ku heta ku ezeb bimana, wê mēr nedîtana.'" (50).

Li Kamchdalê jî, mēr dema dibîna ku jina wî ezeb e, ji diya keçikê re dixeyide û dibêje, "di gihîştandina keçikê de bi îmalkarî hatiye hereket kirin" (51). Madem wisa ye li gorî ku Durant nîşan dide, çî bû sebeb ku ezebtî jî dirûvê kebbetê derket û ket dirûvê fazîletê? Bêguman, mulkiyeta taybet bû. Di pergala mulkiyetzanîna taybet de, ji ber ku jin zêdetir wekî mulk tê hesibandin, destnedayî, pak û paqîjbûyîn hate xwestin; çunkî, mafê bikaranîna jina ku wekî mal tê hesibandin, tenê aîdê wî mēri bû ku ji aliyê civakê ve meşrû dihat dîtîna. Lê, tevî kapitalîzmê jî bo ku jin kete rewşa metayê, ezebtîyê jî rola xwe wînda kir. Lewre, astengiyên li ber têkiliyên cinsî hinek be jî ji holê rabûn. Heta hin kesan xwe ji qalkirina "Şoreşa cinsiyetê" jî nedan paş. Dema wisa ji çêbû, romantîzme ber bi paş de gav avêt û eşqê derbeyeke xedar xwar. Belê, bi rastî jî, kapitalîzmê derbeyek li eşqê da û eşq ancax, (tu car nayê maneya anarşîzma cinsiyetê) wê di civaka komunal a pêşdeçûyî de bimire. Ji ber wê yekê jî, proleterya di eynî demê de wê bibe gorkola eşqê.

Îşareta ku ev gotegot nîşanî me dide, şerê di navbera Kabil û Habil e. Çunkî, li gorî ku tê diyarkirin sedema vî şerî "mesleyeke keçikekê" bûye. Ji Habil û Kabil ku zarokên Adem in, di Quranê de jî tê behskirin. Li gorî mufesîrên (şîrovevanên) Quranê, di her carê de ji Adem re cotek zarok çêdibû; yek kurik û yê din jî keçik. Kurikê ku pêşî welidiye, bi keçika ku paşiyê welidiye re dizewicî. Di dawiyê de, du kurê Adem bi navê Habil û Kabil çêbûne. Keçika ku cotê Kabil e, ji ber ku ji cota Habil delaltir e, Kabil nexwestîye cota xwe bide Habil û xwestîye pê re bizewice. Adem jî gotîye ku, divê ji Xwedê re qurbanî bidin, qurbana kîjanî were qebûlîkirin ewê bi wê keçikê re bizewice. Di dawiyê de Xwedê, dema qurbana Habil ku ew şivan e, qebûl dike, Kabil jî ku ew jî cotyar e, ji Habil dihesidê û wî dîkuje (52). Çîrok bi vê şeweyê, tê qebûlîkirin ku jêderka xwe ji mîtoseke Sumeran standîye. Her wiha Samuel Noah Kramer di pirtûka xwe de ya ku bi navê "Tarih Sumer'de Başlar" (Dîrok li Sumerê dest pê dike) tê zanîn, di beşa "Seksin İlk Sembolleştirilmesi" (Sembolîzasyonkirina yekemîn a seksê) de, li ser vê gotegotê sumeranî disekine û dibêje ev, çîroka Habil-Kabil tîne bîra mirov (53). Li vê derê dîsa em li temayên eşq û hesûdîyê cinsî rast tîn. Jixwe mufesîrên Qura-

nê tiştê ku mîna ahd (adak) fikirîne jî, esas jî xeynî qelenê ne tu tişt e. Qelen jî, li ber xwegihandina xweşîkî û di riya bi-destxistina xweşîkiyê de astengiyêke girîng e. Dema em fikra "astengî eşqê zêdetir dike" bicibînin, em girîngiya vê jî dafînin holê. Ji ber wê yekê, em gerek nabînin ku, vê zêdetir û dirêjtir binirxînin.

Ku bi awayekî kurt em bibêjin, eşq, li gorî ku tê zenkirin, ne rastiyeke ku di Ewrûpaya Serdema Navîn de derketiye holê, berevajî, gelek beriya wî, diyardeyêke ku di Rojhilata Nêzîk a kevn de, bi taybetî jî di erdên kurdan de şîn bûye, ye. Beramberî pergala mulkzanîna taybet, statuya civakî ya jinan guheriyê û ev guherîn jî, a rast, bûye ketina jinan.

Hema bêje her lêkolîner û arkeolog hemfikir in ku; çandiniyê li çiyayên Kurdistanê dest pê kiriyê. Mesela, gelek zan-yar mîna R.J. Braidwood, "Heyva bijûn" (the fertile crescent) û derdora wê esas digirin. James Mellart di pirtûka xwe ya bi navê "Yakîn Doğunun (En) Erken Uygârlıkları" (Şaristanîyên herî pêşîn ên Rojhilata Nêzîk) de, dinivîse ku, şaristanî herî kêm di sê navendê de (dibe ku zêdetir be) bi pêş ve çûye. Ev sê navend jî yên ku li Rojhilata Nêzîk in; gelî û kendalên li rojavayê çiyayên Zagrosê, herêma çiyayî ya Mezopotamyaya bakur û Deşta Anatoliya Başûr in (54).

Dîsa, di serî de Braidwood û gelek zan-yar û lêkolîner hemfikir in ku, çandiniyê li hevrazên çiyayan de dest pê kiriyê. Ev jî, di serî de cenet, tê maneyêke dunyevî û rastiya ku ew îfadeya çiyayekî ye dielîmîne. Di Quranê de jî, tê gotin ku Adem li ser rûyê dinyayê hatiye afirandin (55). Di erebî de koka lêkera "dakevin" hubût, tê maneyên "ji cihekî bilind, daketin", "ji kaşekî ber bi jêr çûyîn" in. Li gorî wê, ceneta ku Adem lê hatiye afir-

Crawley "Eger, em hêmanên folklorîk ji çîroka sêv a Hawayê derxin, li paşya vê rastiye, bi ihtimaleke mezin pratîkeke eşqê an jî ahenga zewacê wê were dîtin. Rastiyeke ku tê dîtin jî ev e; dema, em van hêmanan tev bînin ba hev, li ber çavên me rastiyeke din wê derkeve holê: Eşq, li Kurdistanê dest pê dike...

randin li ser girekî bûye. Adem jî wê derê daketiye rastê. Ji vê yekê re, hubût te gotin. Ew tişt û li quntarên çiyayan dest-pêkirina karê çandiniyê, jî wê derê jî daketina deştan û pê re afirandina şaristanîyan, li hev tînin.

Di gelek mîtolojiyan de, enteresan e, cenet an bi çiyayekî re hatiye wekhevkirin an jî li ser çiyayekî hatiye hesibandin. Mesela, çiyayê pîroz Meru ya hîndûyan, çiyayekî bi vî rengî ye. Di vî çiyayî de ku ji aliyê ejdirhayekî ve tê parastin, çar çem û bexçe hebûne (56). Di mîtolojiya Çînê de jî wekî wî "bexçeyekî çiyayî" (garden mountain) heye. Di vî bexçeyî de jî çar çem diherikin; ava nemiriyê (ab-î hayat) jî li wir e û wê derê bi navê Kaiming heywanek diparêze (57). Tê dîtin ku, cenet sîmgeyêke mîtolojîk a çiyayekî ye, li gorî îfadeya olên yekyêzdantiyê sîmgeya çiyayên Kurdistanê ye. Jixwe, di Tevratê de, yek ji çar çemên ku tê behskirin, Ferad, ya din jî Dîcle ye. Li gorî îdiaya Joseph Karst, Mezopotamyayî-Babilî (Das mesopotam-babylonische) peyva ku tê maneya bihuştê, esas tenê modîfikasyonêke navê Ferad (Phuratu) ango şeweyêke cihê ya navê wî çemî ye (58).

Piştî ku Kabil Habil dîkuje, ji aliyê

xwedê ve sirgûnî welatê Nodê dibe. Di vî ez bêjim ku welatê Nodê jî li Kurdistanê ye. Emil G. Kraeling jî nivîsiye ku Nod li Kurdistanê ye (59).

Wek gotina dawî em dikarin ve bibêjin: Daketina ji cenetê ya însanîyê, di rastiye de tê maneya bi eşqê ketin e jî (60). Lewre di vê gotegotê de, ji sêvê heta mar, ji ferqkirina, xwe 'nu' dîtina Adem û Hawa, heta tîgîhîştina wan a ferqiyeta xweşîkî (baş) û nexweşîkbûnê (xerab) û ehdên ku Habil û Kabil dane, (wekî qelen mirov dikare binirxîne), ew hemû tişt wekî hêmanên ku bîngêhê ji zayîna eşqê re amade dikin, derdikevin rastê. Her wiha, Ernest Crawley jî, di xebata xwe ya bi navê "Mystic Rose" de, vê rastiye bi vî awayî tîne zimên: "If we can isolate the folklore/ element in the story of Eve's apple, it seems most probable that some such love-practice or marriage rite as this is behind it." (61) (abç). Crawley ev gotiye: "Eger, em hêmanên folklorîk ji çîroka sêv a Hawayê derxin, li paşya vê rastiye, bi ihtimalekê, hem jî bi ihtimaleke mezin pratîkeke eşqê an jî ahenga zewacê wê were dîtin. Rastiyeke ku tê dîtin jî ev e dema, em van hêmanan tev bînin ba hev, li ber çavên me rastiyeke din wê derkeve

holê: Eşq, li Kurdistanê dest pê dike...


ÇAVKANÎ

43. Durant, rpl.160-1
44. Rollo May, *Yaratma Cesareti, wergera tirkî: Alper Oysal, (Stenbol, 1992), rpl.98-9, wekî din binêrin. Batî'da Aşk ve Cinsellik, rpl.140*
45. J. Campbell, rpl.14
46. G. Aksoy, rpl.121
47. Ibid. Idem
48. Ibid. Idem
49. Durant, rpl.
50. Ibid, rpl.92
51. Ibid, rpl.91-2
52. Süleyman Ateş, *Kur'an-ı Kerim Tefsiri, Milliyet Yayınları, (Stenbol, 1995), C.I, rpl.770-1*
53. Kramer, rpl.121 û 242-8
54. G. Aksoy, *Kürt Dili ve Söylenceleri Üzerine İncelemeler, C.I, (Enqere, 1991), rpl.*
55. Ateş, rpl.131
56. J.A. MacCulloch, *Fall (Ethnic), The Encyclopedia of Religion and Ethics, Beş.5, rpl.712*
57. Ibid. Idem
58. Joseph Karst, *Origines Mediterraneae Die Vorgeschichtlichen Mittelmeervölker, (Heidelberg, 1931), rpl.436*
59. Emil G. Kraeling, *Bible Atlas, (New York, ?), rpl.42*
60. Di hin zimanên Ewrûpiyan de, mîna îngilîzî û fransîzî de peyva "aşîq bûyîn" nîn e. Ew, peyva ketina eşqê (tomber, fall)bi kar tînin. (Francesco Alberoni, *Aşîk Olma ve Aşk, wergera tirkî: Gül Çetinor, Stenbol, 1990, rpl.94*)
61. Ernest Crawley, *The Mystic Rose, A Study of Primitive Marriage and of Primitive Thought in its Bearing on Marriage, (London, 1965), Chapter XIII, Section I, rpl.132-3*

Werger: NUR-HAYAT

Gelo dewlet çawa îflas dike?

MEDENÎ FERHO



Ne mirovek, ne dezgeheke karbidest; ne bazirganek, dewletek! Ku dirav di xezîneyê de nemînin. Deyndarî, ji hundir û derve ve neqam dibe û nikaribe bide... Ne bes rastmalê deynan selef jî, bibe bargiraniyek pir mezin û têkeve ser rastmalê û selefa selefê bide dayîn...

An jî her serê sê mehan bi riya çapa banknotên bêbersiv bê dayîn. Dewaluasyon her û her di masetê de be.. Selefa deynên derve jî, ku pêwistiya kambiyo tê de heye, bi rewşêke parsekî devê deriyên bankayên din bête dayîn...

Ji bilî xanûmalên gelî, pir, dezgehên gelî, xezîne bi xwe jî, têkeve mezatê, par bi par bi riya bono û sertîfikayan bînin firotin... Ev bono û sertîfîka bîne firotin.. Ev bono û sertîfîka derdikevin borse û bazarê bi demên kin, yê sê mehî selefê bide.. Ew selef jî bêhtir ji selefa banka û çarşiyê be..Valahî û tîkçûna hatina salane bi 800 trilyon lîreyî be... Enflasyon li dora ji sedî 70-80 yî bileyize. Û wezîrê malxwetiye, milkuliya pêşerojê û zêdebûna enflasyonê

diyar bike. Li hemberî ragihandina berdevkên malxwetiye û zanyarên aboriyê, saziya İstatîska Dewletê van hejmaran bi xap û rîpên mehane ji komên xelkan veşêrin..

IMF, der heqê xwedî lê derneketina peymanên deyndariya vê dewletê de şikê bibîne û Stand-by daxuyan bike. Peymanên wê her bê îkbal bîne dîtin û daxuyankirin... Ragihandina aboriya pêşerojê di rêşiyê de bibîne.. Seyran bi yek carê rawestiya be.. Qeraxên deryayan û cihên seyranê vala bin.. Biyan, bi rêbûwarî jî di wî welatî re nebihurin..Ew dewlet pêwistî şûka reş bibe û diravên deyn ji % 150 bi selef belav bike...

Ji bilî wê, destên xwe vekin û pêwistî parsekiya welatiyên xwe ku li derveyê welat karker in, bibe.. Selef bikeve ser hevûdin. Trenda mezinbûn û firehbûnê, yanê pêşdeçûna îktîsadî dabikeve... Mesrefa yek karkerî di kîlerê de 15 milyon 280 hezar be.. Hatina karker jî, 5 milyon 500 hezar be.. Kirêya xaniyekî ji 3 milyon dest pê bike. Mesrefa zarokêkî bi dibistanê 3 milyon 500 hezar be.

Valahiya bazirganiya derve, yanê hinardeyê (İhracat) ji 1 milyar dolarî û bêhtir be.. Valahiya karbandiya carekê 2 milyar dolar be..Wekheviya (hevkeşe) aborî serûbinê hevûdin bûbe.. Gundî bêzar û neçar bin. Bajarî bêmecal û tengezar bin. Komên xelkê bêkar û bar bin.. Hê jî ji bo çekdariya leşkerî 8 milyar dolar xerc bike..

Ji bilî wê ji Almaniyayê her sal 6 milyar DM bistîne. Û ne di riyên normal re, ji paş ve toqmaqê Yekîtiya Ewrûpayê lê bixe. Ne bes di hêla aborî de, polîtîk û ya tevgera komaleyê têxe bin kontrola komîsyona vê yekîtiyê. Armanç, alîkariya diravan be.. Brokratên wê xwe li devê deriyên dezgehên kongreya senatoran û bankayên Amerîkayê stûxwar bike..

Dewleta ku nikaribe karbandiya tenduristiyê bi cih bîne... Dewleta ku nikaribe karbandiya perwerdekirinê pêk bîne.. Dewleta ku nikaribe bala xwe berde ser şikestî û pîrsîrêkên komên xelkê.. Enerjî û karbidestî her û her qels bibe...

Ji bilî van biçe, ji sûka reş diravan deyn bike û çekan bikire. Li hemberî mal û mewdan ji Sovyetistanê 134 milyar dolarî çek bikire. Gelo hê jî berdevkên wê dewletê dikarin bêjin dewleta me li ser lingên xwe ye? Dikarin bibêjin, dewleta me di hêla aborî de baş e? Gelo dikarin bêjin aboriya dewleta me bi ser hevûdin ve neherifiye? Gelo, hin zanyarên aboriyê hene ku dikarin bêjin dewleteke bi vî rengî û di rewşê de îflas nekiriye?

Êdî ev rewş ne bes bi navê enflasyonê tê naskirin. Li nav kurdan ji malxerabûnê wêdatir, malhidîmîtî heye.. Êdî, rewş hew jê kambaxtir heye. Hem can diçe, hem jî mal û mewcan. Ev malhidîmîtî ye... Li gorî van ragihandinan navê rewşa dewleta Tirkîyê ne malxerabûn e, malhidîmîtî ye..

1 Gulan dîsa bi xwînê sor bû...

Wekî her carî dewletê dîsa Cejna 1 Gulan di nav xwînê de hişt. Li bajarê Stenbolê, polîsan xwepêşandar gulebaran kirin, 3 kes mirin, 48 kes jî birindar bûn û bi sedan kes ji aliyê polîsan ve hatin girtin.

Wekî her carî dewletê dîsa Cejna 1 Gulan di nav xwînê de hişt... Li bajarê Stenbolê, polîsan xwepêşandar gulebaran kirin, 3 kes mirin, 48 kes jî birindar bûn û bi sedan kes ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Li bajarê Îzmîrê jî polîsan êrîş birin ser xwepêşandaran, 21 kes birindar bûn. Li Enqere, Edene û li bajarê Mêrsînê Cejna 1 Gulanê bêkuştin û pevçûn hate pîrozkirin.

Li bajarê Stenbolê piştî 18 salan cejna karker û xebatkarên bi mitîngeke herî mezin hate pîrozkirin. Zêdeyî 150 hezar însan beşdarî mitîngê bûn. Ji xeynî sendikayên Türk-İş, DİSK, Hak-İş û sendikaya KESK'ê, HADEP, ÖDP, DBP û EP jî beşdarî mitîngê bûn. Ji van partiyên legal pê ve PKK, DHKP/C, MLKP, TİKB û TİKKO jî beşdar bûn. Sloganên wekî "Bijî 1 Gulan!", "Bijî biratiya gelan!", "Bijî sosyalîzm!", "Bijî PKK! Bijî Serok APO!", "Bijî aşî û cejna karkeran!", "Di şer de jî, di aşîyê de jî em bi te re ne Öcalan!" bal kişandin.

Serê sibê saet ji neh û nîvan pê ve, li ber Belediyeya Kadıköyê xwepêşandar li hev civiyan. Saet di deh û nîvan de polîsan li komek xwepêşandaran ji ber ku nehiştin lêgerîn li ser wan çêbikin, gule barandin; du kesên bi navê Hasan Albayrak û Dursun Odabaşı hatin kuştin. Li ser vê bûyerê bi taybetî xortan bi dar û kevîran camên derdora îstasyona trenê anîn xwarê; êrîş birin ser polîsan. Bi alîkariya rêveberên HADEP'ê, şerê di navbera xwepêşandar û polîsan de, rawestiya.

Li Meydana Kadıköyê grubên çep nehiştin ku Serokê Sendikaya DİSK'ê Rıdvan Budak û Serokê Sendikaya KESK'ê Siyami Erdem bi axivîn. Li ser vê yekê sendikayan meydan terk kirin. Hê hemû kes negihîştibûn meydanê, mitîngê belav bû. Dema kortaja HADEP'ê, ku zêdeyî bist hezarî bû, kete meydanê, ji wan pê ve kes nemabû.

Êdî her kes diçû. Di navbera MLKP'ê û polîsan de şer derket. Piştî ku kesên MLKP'ê camên bankayan anîn xwarê û polîs dane ber kevîran, polîsan jî li wan gule barandin... Li vir jî kesekî bi navê Levent Yalçın hate

kuştin û gelek kes birindar bûn. Di nav birindaran de polîs jî hebûn. Piştî ku polîsan bi çekan êrîş birin ser xwepêşandaran û ew belav kirin, bi sedan kes girtin, ew xistin binçav; dibe ku hejmara miriyan zêdetir bibe.

Li aliyê din, piştî 18 salan careke din 1 Gulanê xwe dirêjî Meydana Taksimê kir... Partiya SİP'ê jî xwest ku Cejna 1 Gulanê li Meydana Taksimê pîroz bikin, lê polîsan rê nedane wan, êrîş birin ser wan û ji wan çend kes birindar kirin. Piştî re ku Serokê SİP'ê Aydemir Güler bi polîsan re axivî, polîsan destûr dan ku li serê Kazancı Yokuşu ku di sala 1978'yan de lê gelek kes hatibûn kuştin, daxuyaniya çapemeniyê bidin.

Li bajarê Îzmîrê jî dewletê êrîş kir

Li bajarê Îzmîrê jî nezikî 25 hezar kesî Cejna 1 Gulanê li Meydana Cumhuriyetê pîroz kirin. Mitînga Îzmîrê jî bi beşdariya HADEP, ÖDP, EP, NÇM û grubên çepgir ji navçeya Konakê dest pê kir. Dema serê kortejê gihîştê Meydana Cumhuriyetê, polîsan hinek al û afîş kirin mane û êrîş birin ser gel û 6 polîs û 16 xwepêşandar birindar bûn û polîsan gelek kes jî girtin binçav.

Dem a bixwazî xwîn nayê rêtin

Cejna 1 Gulanê li Enqere, Edene û li bajarê Mêrsînê bêxwînrijandin hate pîrozkirin. Li Enqereyê bi beşdariya HADEP, DBP, İP û CHP'ê li Meydana Tandoğanê bi beşdariya 15 hezar kesî hate pîrozkirin. Xwepêşandaran slogan avêtin, siyaseta dewletê rexne kirin û aşî xwestin.

Li bajarê Mêrsînê bi beşdariya nêzikî 15 hezar kesî, li Edeneyê jî bi beşdariya hezar kesî hate pîrozkirin. Ji ber kû polîsan mudaxele nekirin, tu problem derneketin. Yanê dema ku xwînretinê nexwazî, mitîngên bêkuştin û girtin jî çêdibin. Her wiha helwesta hin çepgirên a li bûyera Stenbolê, bû sedema rexne û nîqaşan. Gelek kesî diyar kir ku, kirinên bi vî rengî sî daye ser meşrûbûna cejnê.

Li bajarên Kurdistanê jî, dewletê destûra pîrozkirina 1 Gulanê neda.

**AZADIYA WELAT
STENBOL, ÇUKUROVA, İZMİR**

Li bajarê Îzmîrê jî polîsan êrîş birin ser xwepêşandaran 21 kes birindar bûn. Li Enqere, Edene û li bajarê Mêrsînê Cejna 1 Gulanê bêkuştin û pevçûn hate pîrozkirin.



Ew xêrê ji bazara xwe nebînin!..

Rojekê Harûn Reşîd gazî Balûr dike, hinek zêr didê û jê re dibêje:

– Ev zekata min e, bibe belav bike...

– Temam, ez li gorî edaleta xwe, an li gorî edaleta Xwedê belav bikim?..

– Dîsa berûpaş xeber nede! Li gorî edaleta Xwedê, helbet...

Balûr dibêje "baş e" û diçe...

Harûn Reşîd piştî çend rojan dibihîze ku Balûr, zekat li dewlemendan belav kiriye; heke yek dabe feqîran, sed daye dewlemendan... Dişîne pey, wî tîne dîwana xwe û bi hêrs jê dipirse:

– Kuro malmîrat, ev çi hal e! Ma dewlemend hewceyî zekatê ne, ku te bîriye zekat tev li wan belav kiriye?!

– Çima hêrs dibî, Xwedê jê razî! Ma ne te got; bibe li gorî edaleta Xwedê belav bike?.. Min jî bi gotina te kir! Xwedê zêde dabe kê, min jî zêde dayê û kê m dabe kê jî, min jî kê m dayê!.. Sûcê min çi ye?! Te bigota; li gorî edaleta xwe belav bike; minê bibira tev li feqîran belav bikira... Lê te got; li gorî edaleta Xwedê... Ez çi bikim?

Pêşiyên me, ji me re tu tişt, tu gotin nehiştine... Em li ser çi bifikirin; pêşiyên li ser wê mijarê gotineke wisa saxlem û di cihê xwe de gotine, ku ji Pîramîdên Firewnan û ji Pîra Mala Badê jî sext û saxlemtir e...

Mesela gotine: "Carekê Xwedê nestîne, ku stand; ji her aliyê ve distîne..." Ma ev ne rast e?

Ji bo mêrikê dewlemend her roj cejn e, şahî û seyran e, li pêşiya kêf û şahiya wan, cejn û seyranan wan tu astengî tune ye... Çi bixwazin, dikin. Kes nabêje, çima? Û kes nikare ji wan re bibêje siya we jî xwar e!..

Lê, mêrikê feqîr jî wisa ye? Na!.. Kî, çi bixwaze, dikare ji wan re bibêje û dema bi gotinan tenê qayil nebîn; çi bixwazin dikarin bi wan bikin û bidine kirin... Bi feqîriya wan, carekê Xwedê jî wan standiye; ew çi bikin bêfeyde ye...

Ji sêsed û şêst û pênc rojên salê, rojêke wan tenê heye, lê ji ber ku vê rojê jî, ji wan re zêde dibînin, dewlemend û sistema dewlemendan vî rojê jî li wan dikine kafîr-keratî û dihêlin!..

Ev roj, yanê 1 Gulan tim û tim bi rengê xwîna wan tê xemilandin, bi êş û jana wan te mistdan, û bi laşê kuştîyên wan tê gubrekirin... Jixwe ev roj berî niha bi sed û deh sal berê, li Amerîkayê di nav gola xwîna wan de şîn hatiye... Her çi qas li Amerîka û li hemû welatên rojavayê êdî cejna 1 Gulanê bi xwînê neyê xemilandin jî, ev dewleta tirk, ku bêhtir ji destpêka "Medeniyeta Mûasir" hez dike, ev wezîfe hildaye ser xwe û bi qehremanî didomîne!..

Bi rastî jî, ev çêtir li bejn û bala wan tê...

Em çi bibêjin?

Ew xêrê ji bazara xwe nebînin!..

RAHMÎ BATUR



- 5.5.1932
Komara Tirkiyeyê bi navê "Mecbûrî İskan" qanûnek, piştî Serhildana Çiyayê Agirî ji bo kurdan derxist. Armanca "Mecbûrî İskan"ê ji hev belavkirina eşîrên kurdan û destdanîna mal û milkên axa, beg û şêxên kurdan bû. Her wiha bi çekirina vê qanûnê, dixwestin ku rê li ber serhildanên kurdan bigirin.
- 5.5.1818
Karl Marks li bajarê Almanyayê li Trierê hate dinyayê.
- 6.5.1972
Ji rêberên partiya THKO'yê Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan, Hüseyin

- Inan ji aliyê Komara Tirk ve li Enqereyê hatin daleqandin.
- 9.5.1945
Roja Serkeftina Şerê Dinyayê yê Duyemîn. Şerê Cihanê yê Duyemîn wekî tê zanîn bi îşxalkirina Çekoslovakayê ji aliyê Almanan dest pê kir. Di salên 1940'an de Îtalya jî piştgirî da Almanyayê û ew jî beşdarî şer bû.
- Ewrûpa-tev bû meydanê şer. Bi beşdariya Amerîkayê li hemberî Almaniya û Îtalya ve, her du dewlet tîk çûn. Di şer de 10 milyon însan mirin; bi milyonan mirov jî seqet man, bi tenê 40 hezar ton bombe li paytexta Almanyayê Berlinê hatin barandin.

AWIR

Li Tirkiyeyê qanûn ji bo qedexekirina mafan in

Wekî tê zanîn qanûn, ji bo ku pirsgirêka herî biçûk jî qanûn bê çekirin ew civak, civakeke lîpaşmayî ye. Dîsa heke qanûn bêne çekirin ew ji bo qedexekirina mafan an ji bo mafdayîna ne?" Lê li Tirkiyeyê mafên herî bingeşî tene qedexekirin, piştî re ji bo dayîna van mafên ku di pratîkê de qedexekirina wan ne gengaz e, qanûn tene çekirin.

Piştî vê agahiyê tê dîtin ku li tu deverên dinyayê wekî komara tirk ji bo lîpaşîştin û asimîlekirina gelekî ewqas zêde qanûn nehatine derxistin. Ji avabûna komara tirk he ta roja îro, hema hema her sal li dijî hêzên dijber, bi taybetî jî kurdan, qanûn hatine çekirin û tene çekirin jî.

Piştî Serhildan Çiyayê Agirî di 5'ê gulan 1931'an de, bi navê "Mecbûrî İskan" qanûnek ji bo kurdên Bazîd, Qers û Îdirê hate çekirin. Armanca dewleta tirk berî her tiştî ew bû ku li herêmê, kurdan ji hev veqetîne; asimîle bike. Bi vê mebestê tirkmanan li herêmê bi cih bike. Qanûn di bin çar beşan de hatiye danîn; di beşa yekemîn de ji bo bandora serokeşîrên herêmê ji ser gel bê rakirin, hin gavên pêwîst hatine rêz kirin.

Qanûn wiha ye:
A) Ev qanûn eşîr û şexsiyetên bi hikum nas nake. Di vê xisûsê de çî mafên wan hebe, gişkî dide destê dewletê. Serokatiya eşîran, begî û şêxî belgeyên bi van re eleqedar çî hebe nayê qebûl kirin û saziyên bi van ve girêdahî çî hebî jî holê hatine rakirin.

B) Mal û milkên eşîretên herêmê bi tevî yên ku bitapo an jî bêtapo gişt malê dewletê ne. Li gorî vê qanûnê ew mal û milkên wan bi tevî wê li penaber û koçberan û li gelê ku li herêmê bêzevî ne, an jî rênçberên di halê xwe de ne bê, belavkirin.

(Ev rasterast eşîreta ku beşdar û piştgirî ya serhiladnê kiriye eşîreta Celalî ye. Penaber û koçber anîna herêmê jî ji bo asimîlasyonê kurdan e. M.A)

C) Li gorî vê qanûnê, kesên ku serokên

eşîran in, şêx, axa, beg wê tevî ji herêmê bêne dârxistin. Wê li rojavayê Tirkiyeyê bêne bicihkirin. Ev kirin wê bi destê wezaretiya hundir û bi destê wezaretiya civakê bê kirin.

D) Kesên tirk be, ji çanda tirkî be, ji kultura tirkî be, wê li herêmê bêne bicihkirin. Kesên ku tirk nebe û bi kultura tirkî ne, wê jî sinorê Tirkiyeyê bêne derxistin.

Ev qanûn bi vî awayî kurd ji welatên wan bi dîr dixistin û yên ku li herêmê diman jî, ji bo ku bêne asimîlekirin, penaberên tirk û koçberên tirk li herêmê dihate bicihkirin.

Berî Serhildana Çiyayê Agirî, Serhildana Qoçgirî di sala 1919'an de ku çêbûbû jî dîsa qanûnek ji bo ku mal û milkên kesên ku beşdarî serhildanê bûbûn, hatibû derxistin. Dewletê bi derxistina vê qanûnê dest danîbû ser mal û milkên wan.

Di Serhildana Şêx Seîd de jî qanûna "Tahrîrî Sukûn" hatiye derxistin, ev jî ji bo asimîlasyonê kurdan bi taybetî hatiye çekirin. Piştî van, di Serhildana Dêrsimê de jî dîsa ji bo gelên herêmê qanûneke koçberkirinê hatiye derxistin.

Jixwe di qanûna bingehîn de ku sala 1924'an çêbûye, di madeya 5'an de nav û paşnavên bi kurdî tene qedexekirin. Bi madeya 42'an ve jî, li Tirkiyeyê perwerdehiya bi zimanê kurdî qedexe dibe. Qanûna îdareya bajaran madeya 5442 1/D-2'an jî navê gundan yanê gundên kurdan bi navê tirkî hatine guhertin.


Li gorî qanûna partiyên siyasî ya bi hejmar 2820'an, madeya 81'an jî mafên hindikahiyên an jî mafên civakê, parastina ol, ziman, nîjadek temsîlkirin qedexe ye û çî partî dibe bila bibe di civînên xwe de, di kongreyên xwe de ji bilî zimanê tirkî tu zimanî nikare bi kar bîne.

Wekî van gelek qanûn di qanûna bingehîn a Tirkiyeyê de cih digirin. Bi kurtahî çî qanûn hatine çekirin ji sedî pênciyê wan li hemberî mafên kurdan û hindikahiyên li Tirkiyeyê hatine çekirin. Yanê qanûn li Tirkiyeyê ji bo ku mafên civakan, gelan bêne qedexekirin tene çekirin. Ji bo ku pirsgirêka herî biçûkê, gelan bêne çareser kirin nayên çekirin.

METİN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

AMED TIGRÎS



Ji şagirtên jêhatî hostayên baş derdikevin

Programên MED-TV yên ku bi zimanê kurdî tene pêşkêşkirin, ji aliyê zimên ve gelekî qels û jar in. Piraniya programan bi kurdiyê herêmî û çekirî, tene pêşkêşkirin. Ziman kalîteya programê dadixe û temaşevanên ji televizyonê bi dîr dixê. Wê demê temaşevan li kanalên din digerin. Pêşkêşvanên programan nikarin bersiva temaşevanên bidin. Bi xwe û bi kurdiya xwe, ne bawer in. Bi taybetî ev rewş di programên zindî de baş diyar dibe. Mesela di programeke "Şox û Şeng"ê de çend temaşevanên di telefonê de wiha digotin: "Em ji Serhedê ne û ji kurdiya we fêma nakin. Hûn bi devoka Amed û Mêrdînê dipeyivin. Çima hûn bi devoka Serhedê jî napeyivin? Malîyên me ji kurdiya we fêma nakin..."

Amadekara programê bersiveke zelal neda temaşevanê serhedî. Jixwe nikaribû bide jî, ji ber ku amadekara programê, ne bi kurdiya Amed û Mêrdînê, bi kurdiya gundê xwe dipeyivî. Dema mirov guhdariya wê dike, dibêje qey ew ji serkanî an jî bêdera gundê xwe, bi gundiya xwe re dipeyive. An jî ew li bêriyê ye... Nizane ku 30-40 milyon mirov li wê temaşeyê dikin. Ev yek. A diduyan, jixwe ew nikare bibêje: "Em bi kurdiyê nivîskî û yekgirtî, yanê bi kurdiyê standart dipeyivin. Armanca televizyona me pekanîna zimanekî neteweyî ye, ne herêmî ye..."

Ev yek, ne bi tenê ji bo programa "Şox û Şeng"ê ye; her wiha ji bo gelek programên din ên ku di MED-TV'yê de bi zimanê kurdî tene pêşkêşkirin jî, derbas dibe. Ji ber vê yekê, ez dixwazim navê çend programên din jî bidim ku ferqa wan û ya "Şox û Şeng"ê tune an jî gelek kêma e. Mesela programên Arkeolojî, Zimanê Huner, Hêvî û Daxwazên Gel, Jin û Jiyan, Gotûbêj, Jiyana Gel û carinan Nûçe û hwd.

Ziman girîng e. Dema ziman jar be, çewt û şaş be, wê demê tesîrê li naverokê jî dike û wê jî bi xwe re jar û qels dike. Temaşevan teşwîkî kanalên din dike. Rast e, dagirkeran zimanê me qedexe kirine û me nikaribûye heta niha bi zimanê xwe bixwenda û binivîsanda. Lê, heger mirov bixwaze, dikare di demeke gelek kurt de, baş hîmî zimanê xwe bibe. Bi taybetî ev yek û rewş jî bo ew kesên ku di demê dezgehên çandî û wêjeyî de dixebitin, gelek girîng e. Ji ber ku karên wan ên rojane ev. Gotineke pêşiyên heye: "Ji te cehd û ji Xwedê jî mirad." Yanê heger mirov bixwaze û hewl bide, mirov dikare her tiştî bike û bi ser bikeve. Lê hezar mixabin ku mirov hewldaneke wiha di nav xebatkaran MED-TV'yê de kêma dibîne. Ez dikarim bibêjim ku bi awayekî giştî mirov hewldana xebateke wiha nabîne. Gelek kes hene ku hîn rasterast alfabe ya kurdî nizanin.

Herhal, ji derî me kurdan, tu gel û netewe nîn e ku bi zimanê xwe yê nivîskî nizanibe û bi ser de jî, programan pêşkêş bike. MED-TV, sala xwe tijî kir û ket sala diduyan. Di salekê de heger mirov bixwaze, dikare, di her warî de bi pêş bikeve û xwe nû bike. Lê, ku mirov di salekê de, dest neavêje alfabe û gramera kurdî û wekî şagirtêkî dibistanê serê xwe li serê neşîne, rojname û kovarên kurdî nexwîne û di kursên kurdî re derbas nebe, 20 sal jî derbas bibe, tu guhertin û pêşketin çênabe. Wê demê temaşevan û xwendevan dikevin pêş programçêker, amadekar û nivîskarên.

Di vî warî de, rewşa nivîskar û xebatkaran rojnemeyên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat li ber çav e. Dema Welat dest bi weşana xwe kir, ne bi tenê xebatkar, her wiha rewşa nivîskarên Welat, ji yê MED-TV ya îroyîn xerabtir bû. Lê, îro piraniya wan xwe gihîştandine û gelek bi pêş ketine. Ji wan hinek wiha bi pêş ketine ku nivîsarên nivîskarên 20-30 salan ji aliyê zimên û rastnivîsê ve rast dikin. Ev serkeftineke mezin e.

Ez hêvîdar im ku xebatkaran MED TV hinek be jî, li ser vê rewşê rawestin, dê baştir bibe.

Wênesazê kurd Reşad Yûsif:

Kurdayetî û huner bi hev re dikarin cîhanê bihejînin



Tim biçûkanî, bingeha her avayiyê ye û rehên hunerê şaxên xwe dirêj dikin zaroktiya her hunermendekîlê. Tu karî hinekî vê babetê bidî ber ronahiyê?

● Bûyerên herî bi êş di zaroktiya min de, barkirina mala me ji gund û çûna bajarê Tebqa li hêla Reqayê; li dibistanê ez tim bi tenê bûm. Ez wekî zarokêkî xerîb dihatim naskirin, di nav zarokên ereb de û ji bo ku ez vê tenêtiyê bikujim min wêneyên mirovan çêdikirin. Nemaze wêneyê xalê xwe, ji ber ku ez pir jê ditirsyam. Lê mamosteya min a resimê ya sinifa çaran gelekî guh dida min.

Tê bîra min, min wêneyê wê çêkir û min du bask jê re çêkirin; mîna firîşteyekê min ew didît. Carekê jî min lêdan ji mamosteyê oldariyê xwar, ji ber ku wênesazî karê gunehkaran bû di nêrîna

wî de.

Hêdî hêdî ez di nav zarok û şagirtan de hatim naskirin, heta ez gihîştim xwendina bilind û heta niha jî tu kesî piştî min negirt. Ji pêvî wê mamosteya min a wekî firîşteyekê.

Di wê demê de, berî tu têkevi derya reng û tabloyan, çi daxwaz û hêviyên veşartî di dilê te de hebûn; çi tişt ji te balkêş bûn?

● Di destpêka vebûna çavê min li dinyayê de, rewşa me ya xerab û reş, bindestî, perîşanî û sêwîtiya milletê me li dû tevgera min bû.

Min jî –bi çûkanî– xwe di Ernesto Che Guevara de didît. Min pir li serê xwend. Min wêneyê wî tim çêdikir. Lê xwendin û demê berê, min bêhtir dane hunerê û çî pereyên ku min bi karê xwe kom dikirin, min pirtûk û reng pê dikirin ji dêvla cil û nan. Roj bi roj min

Li Başûrê Biçûk û Başûrê mezin, bi taybetî hunera wênesaziyê zehf bi pêş ketiye. Mirovên wisa ji nav wan parçeyên welatê me rabûne ku, bi serkeftinên xwe em şanaz kirine. E. HELÎM YÛSIV bi wênesaz Reşad Yûsif re axivî ew, bi me da naskirin.

xwe di hunerê de dît û heta roja îro.

Ez dibêjim ev qonax jî, temenê hunermend pir zengin e û di vê demê de têkilyên xurt di navbera hunermend û reng û tabloyê de tene damezrandin, gelo ne wisa ye?

● Belê, berî xwendina akademiye min pir dixwend, li ser dîroka hunerê û ez li pêşangehan hazir dibûm. Gelek carî piştî vegera min ji pêşengehê, min tabloyek çêdikir. Di wê demê de min dilgirt, mixabin wî dilê ez li paş xistim, ji ber ku problemên têkilyên keçikê bi xort re hingî pir in dihêle ku salinen dûv û dirêj ji temenê mirov bêne kuştin. Keçik jî li gorî pereyên pir zavayê xwe hildibêje.

Bi rastî jî kêfa min tê niha ji ber ku dixwaze xwe ji mêrê xwe bide berdan û mêr wê bernade. Gelek carî êşên hinek dibin cihê kêfxweşiyê ji mirov re. Lê dimîne ku ez girêdayî me, (heta bihestî) bi jinê ve. Ev girêdan xuya ye di tabloyên min de.

Dibe sedem jî ew be ku diya min xurtir bû ji bavê min, ez heta niha ji bavê xwe hez dikim bêhtir ji diya xwe. Ji ber ku ez xwe di wî de dibînim; comerd û diltenik e.

Carekê di pêşangehekê de qîzekê ji min re got: “Tabloyên te tevde wêneyên jinan in.. Ji ber ku tu jin di jiyana te de nîn in”. Erê wisa ye, tim ez li jinekê digirim û heta niha min nedîtîye.

Belê wê jina te vê hevpeyvîne bixwîne ha.! Ezê Azadiya Welat bigihînim destên wê..!?

● Xem nake, min yara xwe xiste tabloyekê bi şev, min di xew de dît ku ji tabloyê derket û hate cem min got: “Çi bi te hatiye?” min got: “Ez nexweş im”, ez bi rastî jî nexweş bûm.

Destê xwe di ser dil û canê min re bir; em bûn yeklaş û yekcan. Ez ji xew hişyar bûm; min dît ku ez rihet bûme ji nexweşiyê.

Erê, ez ji jinên tabloyên xwe hez dikim bêhtir ji jinên rastî. Peywendiyên

min bi tabloyê re mîna peywendiyên min bi jinê re ne. Heta ez jê têr nebim ez dest jê bernadim. Heta ku jin xweşik nebe wekî wêneyên tabloyên min, ez nikarim nêzikî wê bibim. Tu karî bibêjî ku ez bi leylan û xeyalê ve girêdayî me, bêhtir ji her tiştî.

Di nav vê leylanê de, çi reng e bêhtir hestên te vêdixin?

● Şînê tarî, sor û spî. Şîn nêzikî siruşt me ye. Sor rengê axa me ye. Spî jî dihêle ku bêhtir şîn û sor xuya bibin, nirxekê dide van her du rengan.

Kurd li vê derê (Başûrê Biçûk) bêhtir li du herêman; Cezîrê (Qamişlo) û Efrînê bi cih dibin. Her herêmek jî taybetiyek di siruşt û tabloyên hunermendên wê de heye; çi peywendî di navbera siruşt û tabloyê de heye di vî warî de?

● Cezîrê deşt e, Efrînê çiya ye. Rengê şîn bi temamî Efrîn digire û rengê zer kirasekî ji zêr li havîna Cezîrê dike. Ev tişt jî di tabloyên hunermendê mezin Beşşar Îsa de xweş xuyanî dike. Ew jî di hevpeyvînekê de dibêje ku li Cezîrê dirêjahiyek heye, di asoyê de qut dibe. Li Efrînê şînaî û mij pirtir e, bilindbûn xuyanî ye û di navbera çiyayekî û yê din de mij valahiyê dadigire. Ango qeto qeto ye. Rengê axê sor e li Efrînê, lê li Cezîrê zer e û bihara wê jî kintir e. Guhertin tê de xurt xuya ye; her demsalek tê, hezar rengî bi xwe re tîne; her demsalek ne wekî ya din e.

Li Efrînê her tim şînahî ye, çiya rê nadin guhertinên mezin di siruştê de; dibe ku ev be sedema pîrbûna hunermendan li Cezîrê û dibe ev be sedema firehbûna rengê şîn di tabloyên min de.. Mînak deşt dihêle tu ji dûranî tiştan bibînî. Li Efrînê ava pişt çiyayekî tu nabînî, eger tu hilnekişî serê çiyê. A herî girîng rastî ye; divê hunermend rast be bi xwe re û bi tabloya xwe re. Fatih Muderis cara yekemîn ku li dinyayê hate naskirin bi tabloya “Kefer Cennê” (Efrîn) bû û Inayet Ettar jî ka-



rê wî dikeve vê riyê û tiştêkî hêja aniye ber çavan.

Di tabloyên kevn de, te bi şeweyekî klasîkî wêne û reng bi hev din re girê didan. Mînak, rûyê jinê xuyanî û berçav bû, lê her bi her "tecrîd" û pêlên rengan her tiştê xuyanî li ber xwe birin û reng man wekî zimanê tabloyê. Gelo çî di dû vê guhertinê de ye?

● Di destpêkê de min dixwest ku ez bidim xuyakirin ku, dikarim xweşik di klasîk de cih bigirim. Çunkî klasîk al-

febeya hunerê ye. Lê min tim xweşiya xwe di rengan de didît. Di destpêkê de tablo du parçe bû, pêşiya wê – mînaka te.. rûyê jinê– ew ji xelkê re bû û dawiya tabloyê cihê min bû.

Min xwest spîbûna tabloyê tevde ji min re be. Berê, mirov tablo tevde zeft dikir, lê niha mirov parçeyek ji tabloyê ye li cem min. Tablo cîhaneke serbixwe ye û ji ber ku mirov parçeyek e.. ne pêwîst e rûyê wî tevde xuyanî be. Di destpêkê de mirov tenê bû, niha cihan

tevde di tabloyê de cih digire.

Kurdayetî û huner (di vê beşê de) çawa bi hev û din re mijûl dibin. Gelek navên kurd û niv-kurd di hunerê de deng dan, gelo dibistaneke kurdî di vê hunerê de hatiye meydanê, an ev rewş bi taybetiya rengên kurdî ve tê girêdan?

● Yek ji çavkaniyên hunerê girêdana hunermend bi ax û welat û ezman û civaka wî ve ye. Em mecbûr in ku em rengê axa xwe, welatê xwe, çiya û deşt

Siruşt me, ax û ezmanê me, welatê me zengîn e bi rengan. Çawa "Xelîca Ereban" bi petrolê zengîn e; wisa welatê me jî bi rengan zengîn e. Taybetiyeke kurdî di tabloyên hunermendên kurd de heye. Lê ez nikarim bibêjim ku dibistaneke kurdî di vî warî de heye. Ji ber ku ez li ser kurdên Başûrê Biçûk tenê dipeyivim.

û ezmanê xwe derxin, wisa, ji ber xwe em dihatin naskirin bi kurdbûna xwe. Ji ber ku rengên kurdî beloq in, xuyanî ne, li ser tabloyên me digotin ev ên kurdan e bêyî ku li navên me binihêrin. Carekê rexnevanekî ereb li ber tabloya min rawestiya û got:

"Tu kurd î ne?" Min bi kêf lê vege-rand "Ereb." Ev reng girêdayî ne bi cilên dê û xwişkên me ve. Siruşt me, ax û ezmanê me, welatê me – li her derê – zengîn e bi rengan. Çawa "Xelîca Ereban" bi petrolê zengîn e, wisa welatê me jî bi rengan zengîn e erê. Taybetiye-ke kurdî di tabloyên hunermendên kurd de heye.

Lê ez nikarim bibêjim ku dibistane-ke kurdî di vî warî de heye. Ji ber ku ez li ser kurdên Başûrê Biçûk tenê dipeyivim. Lê kurdayetî û huner dema tevlihev bibin, dikarin cîhanê bihejînin. Ji ber ku her tîpek ji gotina "Kurdistan" çemine ji êş û xwîn û girî û qiriktaliyê bi xwe re diherikîne.

Ez dikarim bibêjim ku dijmin ne tenê xêr û bêra welatê me diziyê, belê rengên me jî didizînin û hunermendên me jî didizînin. Geh bi şevê û geh jî ro li nîvro.

Divê hunermendê kurd bibe zimanê siruşt me bi vî awayî taybetiya ku me got.. saz dibê û navên gelek hunermendan di vê riyê de dixemilîn. Li Cizîrê Beşşar Îsa, Zuhêr Hesîb, Xelîl E. Qadir, E. Hekîm Huseynî, Reşîd Hîsso, M. Salih Mîsa, Rehîmo.. û gelek hunermendên xort li ser eynî rê dimeşin û li Efrînê Inayet Ettar, Nîhad Gulê û Ehmed Qilêç...Û di pêşerojê de tabloya van navên xweşik wê firehtir û rengintir bibe.

Belê..di pêşerojê de û niha çî kar di nav destên we de hene?

● Em ha..iriya pêşengehekê dikin, ez û hunermendeke jin.

'Ehîd Qetta' ku pûtker e. Ew bi pûtan û ez jî bi çend tabloyan, emê li Heleb û li Şamê pêşengehê vekin.



Kurtejiyana

✓ Di sala 1969'an de li gundê Etmenlî, li Efrînê ji dayikê bû.

Akademiya Huner li Helebê di sala 1986'an de kuta kir.

Beşdarî Pêşangehên

Akademiya Tevdan bû; salên 1989, 1987, 1988'an.

✓ Pêşangeha Hunermendên Efrînê li Zanîngeha Helebê (1989)

Pêşangehek li Navenda Çandî li Safîta ew û du hunermendên ereb (1990)

✓ Pêşangeha Hunermendên Sûrî li salona "Al-Cewşen" (1990)

✓ Pêşangehek bi tenê li Zanîngeha Helebê (1992)

✓ Pêşangeha Bihara Helebê. Salên (1994, 1995)

✓ Pêşangehek li Navenda Çandî li Efrînê bi du hunermendên kurd re Nîhad Turk û Hesko Elî (1995)

✓ Dekorên sê şanoyên erebî li Helebê û bergyên çend pirtûk û kasetan saz kiriyê.

Reşad Yûsif

Dijîtiyên di navbera

Tirkiye û Sûriyeyê de (2)

Dewleta Sûrî bi qasî ku ji Îsraîl ditirse, ewqas jî, ji rejîma kemalîst ditirse, jî ber ku Ava Feradê ji Sûriyeyê re wekî ava jiyane ye. Kengê Tirkiyeyê keysê bibîne wê vê avê li ser Sûriyeyê bibire.

Di, vê domanê de jî şoreşa Kurdistanê bi serokatiya tevgera azadiyê gavên xwe yên dirokî avêtin. Bi taybetî piştî gavavêtina 15'ê Gelawêjê, tevgera azadiyê cihê xwe li Rojhilata Navîn girt. Di van salan de jî, reveberiya Özal derfet ji dijîtiyên Sûrî û Iraqê, Sûrî û paşverûyên ereban dît, li ser vê yekê jî dest bi avakirina Bendava Atatürk kir û projeya GAP'ê, derxist meydanê.

Berî 15'ê Gelawêjê (1984) rojnameyên Tirkiyeyê dinivîsîn û digotin: "Sûriye dîvika Sovyetê ye; Sûrî wekî mîşekê ye, kengê mehmetçikê me bê, wê biperçiqîne."

Piştî 15'ê Gelawêjê rojnamevan û nivîskarên kemalîst zimanê xwe sed û heştê dereceyî guhertin û wiha gotin: "Sûriye cîranê me ye û em dostaniyê dixwazin, em aştîya ereban û Îsraîlê dixwazin. Heger ku Sûriye li dijî terorîzmê raweste, emê pirsgirêka Ava Feradê di nav xwe de rast û rê bikin."

Piştî pêşketina şerê gerîla û tevgera gelê kurd li bakurê Kurdistanê, êdî tevgera azadiyê jî hêla gelek tevger û dewletên radîkal ên li cîhanê û herêmê ve hat naskirin û pejirandin. Di vê demê de dijberiyên Sûrî û rejîma kemalîst gelekî xurt û germ bûn. Li hêla din jî pêşketina întifadaya (raperîna) filistinîyan li dijî Îsraîl, hişt ku dijmanatiya Sûrî û Îsraîlê dijwartir bibe.

Bêguman serokatiya şoreşa Kurdistanê, dijîtiyên di navbera Îran û Iraqê, Tirkiye û Sûrî de bi hostayî xiste bin xizmeta şerê şoreşgerî li Kurdistanê. Di vê demê de her çîqas rûveberiya Özal xwest tîkiliyên xwe û Sûrî xweş bike jî li ser bingehê dijminatîya gelê Kurdistanê, lê belê bi ser neket.

Rêveberiya Baas, bi serokatiya Hafîz Esad, her çendî temsîla burjuwaziya ereb a neteweperest dike jî, ev 25 sal in li dijî siyonîzma Îsraîl û paşverûtiya ereban bi alîkariya sovyetê li ber xwe dide. Her tim jî destê xwe daye destê tevgerên şoreşger û bi çavêkî dostanî û hevalbendî li wan nihêrtîye, li ser dijberiyên di navbera împeryalîzm û sosyalîzmê de siyaseta xwe daye meşandin. Ji ber vê rewşa Sûriyê, daxwazên Özal ku wê bikişîne dek û fenan, hemû pûç derketin.

Piştî Şerê Kendavê (körfez) di navbera Saddam û împeryalîzma cîhanê de, dewleta faşîst a tirk kete tengasiyê mezîn. Li hêlekê pêşketina serhildanên gelê li Kurdistanê, li hêla din jî

rawestandîna petrola Iraqê û bazirganiya wê, hişt ku Tirkiye bêper û bask bimîne. Jixwe qîmeta wê piştî hilweşandina sovyetê bi giranî hatibû ketin. Lê belê Sûriyê piştî Şerê Kendavê xwe xurt kir. Li hêlekê tekiliyên xwe û Misirê û dewletên ereban ên paşverû xweş kirin, li hêla din tîkiliyên xwe û Ewrûpayê jî xweş kirin. Ji ber hostatiya serokatiya Hafîz Esad, Sûrî ji hilweşîna reel sosyalîzmê (sovyetê) gelekî tesîra neyînî nestand, wekî dewletên cîhanê yên nîv-serbixwe, an jî serbixwe.

Di roja me ya îro de, şoreşa Kurdistanê êdî bûye hêzeke gewre û mezin li dinyayê, dewleta Sûrî jî heger bixwaze hinekî bi rûmet xwe li ser piyan bihêle, pêwîst e tîkiliyên xwe bi vê şoreşê re hîn xurt bike an jî wê nikaribe bi rûmetî siyaseta bike.

Di van mehên dîmahiyê de, Sûrî û Îsraîl li Amerîkayê bi hev re li ser maseyê rûniştin, pê re jî li paytexta Sûriyê Şam, Yekîtiya Dewletên Ereban û Sûriyê, li dijî Tirkiyeyê belavokek li ser ava Çemê Feradê îmze kirin û daxuyandin.

Bi van pêşketinan ve girêdayî, şerê medyatîk (çapemenî) di navbera Sûrî û Tirkiyeyê de gihîştê halekî gur û dijwar. Heta gelek serbazên artêşa Tirkiyeyê, li ser şerê di navbera xwe û Sûriyê de bi awayê leşkerî, şîrove û nêrînen xwe gotin. Li hêlekê Tirkiye dibêje: "Sûriye hêlîna terorîzmê ye", li hêla din jî Sûriye dibêje: "Tirkiye ava Feradê li ser min roj bi roj kêr dike û ava ku tê jî hemû pîs û gemaî ye."

Siyaseta Sûrî li ser Iraq û Kurdistanê Başûr û pirsgirêka Qibrîsê bi siyaseta rejîma tirkî re dikeve dijîtiyê. Di van rojên dawîn de, rejîma tirkî çîroka Çemê Asî û "terorîzmê" li dijî Sûriyê derxistiye pêş.

Li ser pirsgirêka "terorîzmê" rejîma Baas li Sûrî her gav vê dibêje: "Terorîzm tiştêk e û şerê serxwebûn û azadiyê tiştêkî din e." Li ser tevgera azadiya Kurdistanê jî bersîveke wiha dide:

"Tevgera azadiyê li her derê heye, hinek kurd di nava sînorên min de hene û ji tevgera azadiyê hez dikin. Erdê min ne hêlîna tevgera kurdan e li dijî Tirkiyeyê, ev pirsgirêka tirkî ya hundirîn e. Tu tîkiliyên min pê re nîn e, gava ku endamên tevgera azadiyê di nav erdên min re derbas dibin, ez wan digirim di avêjim zîndanê; niha jî di zîndanên min de bi dehan girtiyên wan hene."

Li meseleya Çemê Asî jî rejîma Sû-



Hafîz Esad li Sûriyeyê xwediyê giraniyêke taybet e.

ri bi vî hawî mêze dike:

Çemê Asî ji Lubnanê tê xwar û axa, Sûrî derbas dike û di ser axa Antakya û Îskenderûnê re diçe ser Zeryayê Spî, ji ber vê yekê Sûrî çemê Asî çemekî hundirîn dibîne û tu mafê rejîma komara tirkî tê de nabîne, ji ber ku ew Antakya û Îskenderûnê û tevî Asî parçeyekî xwezayî ji cografîyaya xwe dibîne.

Dostaniya Tirkiye û Sûriyê negengaz e

Tiştê ku di asoyê de tê xuyakirin ev in: Heger ku rejîma Sûriyê di civîna aştîyê de bi Îsraîl û Amerîkayê re bikeve tîkiliyên xweş û rind jî, dîsa wê cihê xwe li cem rejîma tirkî, li dijî şoreşa Kurdistanê nestîne. Çima? Çunkî dijîtiyên Sûrî û Tirkiyeyê berdeham in. Li hêla din şoreşa Kurdistanê êdî bûye hêzeke xurt û mezin, çî kesê li Rojhilata Navîn bixwaze siyaseta bike, divê vê hêzê bide ber çavan. Sûrî jî êdî vê yekê fêm dike. Dewleta Sûrî bi qasî ku ji Îsraîl ditirse, ewqas jî ji rejîma kemalîst ditirse, ji ber ku Ava Feradê ji Sûriyê re wekî ava jiyane ye, kengê Tirkiyeyê keysê bibîne wê vê avê li ser Sûriyê bibire.

Jixwe Tirkiye ser û binê Feradê hemû kiriye bendav (beraj). Tîrsa Sûrî ya din jî, ji siyaseta komara tirkî a kedxwariyê dertê, Sûrî baş dizane heger ku Tirkiye serê xwe bilind bike, wê serê ereban biêşîne. Çunkî rejîma tirkî sînorê "Mîsaq-î Millî" nedaye xuyakirin. Heger jê were wê Kurdistanê Başûr (Ker-

kûk-Musûl) û hinek jî axa Sûriyê bixwe nava sînorê "Mîsaq-î Millî"yê. Jixwe di van demên dawîn de dewleta tirkî kontrayê xwe dişîne parçeyê Kurdistanê yê ku di bin destê Sûriyê de ye, da ku li wê derê serêşiyê ji Sûriyê re çêke.


Heta gelek nivîskarên ereban ên demokrat, rejîmê tirkî bi siyaseta tûranîzmê gunehkar dikin, rastiya meseleyê jî jixwe ev e.

Di encama gotara xwe de em dikarin bibêjin, her çîqas Sûrî vê demê gava ber bi sîstema împeryalîzmê ya "nû" ve diavêje jî, lê belê nexweşiyên di navbera wê û Îsraîlê de zû bi zû nayên çareserkirin, nexweşiyên wê bi rejîma tirkî re hîn bêhtir jî dibin.

Mîrov dikare bibêje, dewleta Sûriyê cara yekemîn piştî 30-40 salan, ketiye ser keviya du riyan, an wê bi rast û rê yekîtiya xwe bi gelê herêmê re xurt bike û siyaseta xwe ya nîv-serbixwe biparêze, an jî wê tevî sîstema împeryalîzmê ya "nû" bibe û ji hêz bikeve û çem û çem here.

Bi kurtayî, di Rojhilata Navîn de ne tenê Sûrî, tu dewletên wisa amade ku bi rejîma tirkî re bilivin û li dijî şoreşa Kurdistanê rawestin zêde nayên dîtin, heta Îsraîl her çîqas piştî rejîma kemalîzmê digire jî, newêre rasterast şoreşa Kurdistanê ji xwe re bike armanc û dijminên xwe zêde bike. Heger ku em bidin ber çavan rewşa rejîma tirkî a kambax, wekî mirovekî nexweş e, tu kes naxwaze nêzikahiyê lê bike.

HUSÊN ŞAWÎŞ



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê vê heftiyê ev çalaki hene:

● 5.5.1996 Yekşem

Şanoya Jiyana Nû (Lîstika Rojbaş), saet: 14.00

Konsera Xanemîr saet: 18.00

● 6.5.1996 Duşem

Konsera Agirê Jiyana, saet: 18.00

● 7.5.1996 Sêşem

Konser ji Zanîngeha Boğaziçi (Stranên Biratiyê) û Dengbêj Seyda saet: 18.00

● 8.5.1996 Çarşem

Semînera TOHAVê "Mafên me yên hiqûqî, Axaftvan Ebûqat Talat Tepe, saet: 18.00

● 9.5.1996 Pêncşem

Konsera Kızılırmak, saet: 18.00

● 10.5.1996 În

Konsera Galip Güler, saet: 18.00

● 11.5.1996 Şemî

Konsera Muammer Ketencioğlu, saet: 14.00

Sohbet bi Muhsin Kızılkaya re li ser

"Eşqiyayên berê", saet: 18.00

RÛDAN

Stêrkên şevê



Wan salên
1971-1974)
dengê
îşkencexwara
n li ezman
belav dibû û
Tirkiye
bûbûwekî
îşkencex-
aneyek
mezin.

Deniz Gezmiş,
Yusuf Aslan
û Hüseyin
İnan di wan
rojan de bûn
qehreman,
fırar, girtî û
berdar.

Dîroka kedê, wekî dîroka bûyîna mirovahiyê ye. Lê belê kedxwarî jî xwediyê dîrokeke kevn e. Ji ber ku jiyana wê bi hebûna kedê ve girêdayî ye. Dema ku ked tunebe, tekêliyên hilberîn û birandinê jî zêde ne girîng e. Lê îro êdî bi hêsanî tê gotin ku, kedxwarî hebe an tune be dîsa jî ked her tim gere bîjî. Ji ber ku jiyana mirovahiyê bi hebûna wê didome. Îcar tu tiştê jî cihê wê nastîne.

Heke ku parvekirina hilberîna welat di navbera hemû welatiyan de ne wekî hev be, wê demê problemên mezin derdikevin. Lê her tim di vî warî de kedxwaran neheqî li kedkaran kirine. Ji ber vê yekê her tim serhildana û guherîna şoreşgerî pêk hatine. Ji wê rojê heya îro, ew şer newawestiyê; hê jî didome. Bi wî çavî ku mirov li dîroka nêzik a Tirkiyeyê dinihêre, dibîne ku pêşiya kedxwariyê hatiye berdan û ew wekî malbateke xwînwar xwîna kedkaran dimiye. Rewşenbîrên bina-mûs her tim li dijî vî tiştî derketine. Gava ku xwendekarên dibistanên Tirkiyeyê li ser kedê û tîkiliyê re sekinîn, dest bi xebata guhertina civakê kirin.

Di vê xebatê de gelek ciwanên bi rûmet jiyana xwe ya pîroz bi gorî (feda) kirin û ew rewş hê jî berdewam e. Her tim di destpêka tiştêkî nû de serkêşî hem avanta-jeke mezin e; hem jî dezavantajeke mezin e. Ji vê yekê re bûyera 6'ê gulana 1972'yan mîna-keke baş e. Gere mirov bi wî çavî li wî bûyerê binihêre; pesn û rexneyên xwe bi wê rengî bîne zimên.

Piştî sala 1961'ê qanûnên Tirkiyeyê hatin guhertin. Li ser wê yekê jî civakê êdî mafên ku di zagonê de tune bûn, dix-

west. Karker, gundî û xwendekarên zanîngehan ji bo jiyaneke baş ev tişt pêwîst didîtin. Ev hemû ji bo parvekirina dewlemendiya welat bû; parvekirineke demokratîk û adil bû.

Kirinên xwendekaran li gorî dewletê zêdetir talûke nîşan didan ku serkêşên wan çalakiyan wekî firarî hatin qebûl kirin, ji wan hin kes an hatin kuştin an jî hatin girtin. Wan salan (1971-1974) dengê îşkencexwaran li ezmên belav dibû û Tirkiye bûbû wekî îşkencexaneyek mezin.

Deniz Gezmiş, Yusuf Aslan û Hüseyin İnan di wan rojan de bûn qehreman, fırar, girtî û berdar. Ev her sê ciwan ji bo dinyayeke demokratîk, welatekî serbixwe û azad têkoşîn kirin; pişt re jî ji bo vê armanca xwe ye pîroz, bi hêsanî stûyên xwe dirêjî bendên sêdarê kirin û bi sloganên berxwedanî jiyana xwe, ne bi destên celat, bi destê xwe gihandin dawiyê.


Enfrikayên ku wan rojan di dadgehên Tirkiyeyê de qewimîn haya wan jê çêbû û wan zanibû ku ew dadgeh, ne tenê ji bo wan ji bo her kesî biryarên ne adil didin. Ji ber wê yekê jî wan, biryara der barê xwe de jî qebûl nekirin. Di vî warî de ji pîrsa dozgeran a bi rengê "Baweriya we bi dadgehê heye an nîn e" re, bersiv yek bû: "Em ne bawer in".

Deniz, Yusuf û Hüseyin di navbera 18 û 24'ê adara 1971'an de li navçeyên Sêwazê li Gemerek û Şarkışlayê hatin girtin. Salekê di Girtîgeha Mamakê ya Enqereyê de man û şeva ku 5'ê gulana bi 6'ê gulana ve girê dide, hatin darvekirin. Lê belê, dema ku ew çûn ber darê bi aramiya xwe, serkêşiya xwe selmandin (tescîl kirin).

DÜZGÜN DENİZ

TÎŞK

LERZAN JANDİL



Qom, kultur û hereketê kurdan ser ro tesîrê globalbiyene

Unîversîta Berlîn ya Azade de wendenê kurdoloji roja 23.04.1996 de referatê Martin von Bruinessenî dest kerd ci. Ma nayê ra dime eke rayşte wendendê de înterante bibîme, naye seba wendekaranê xo nê kurcîkî rê nivisnênîme. Sernivîsê referatê Martin von Bruinessenî, sernivîso corên bî. Naca, gumra çî amê vatene. Tenê çîyan ser ro jî diskusiyonî veciyayî. Çiyê ke ma pê qayil nêbenîme, rayşt nêvînenîme jî amê vatene. Nînan ser ro jî amê qesekerdene. La belê çiyê înterant û îlmî jî amê vatene. Ma wayşt ke naca nînan re, yê ke balê ma zêde ont, binivisnîme, ke na der heq de tenê fikir bidîme wendekarî.

1- Kurdî verde tenê tirk, tenê faris, tenê jî ereb bî. Yanê kurdî tirkî, farskî, erebkî fikiriyêne. Angorê sîstemê mektebanê dînan amêne perwerdekerdene. Artêşa dînan de zonê dînan musêne.

2- Zonê kurdan de cudatiyê zaf biye. Kurdan jûbînî fam nêkerdene.

3- Kurdî hemverê jûbînî de wayîrê gelê verhukma bî.

4- Mesela Kurdistanî verde terîtoriyal biye, yanê kotî ke kurdî zaf bî uca de mendêne.

La belê 1960 ra nat organîzasyonanê kurdan şiklê de bîn guret. 1980 de xêlê kurdî veciyayî teberê welatî. Nê kurdî zê kurdanê ke 1960 ra nat seba karî vaciya bî teberê welatî nebî. Nê rewşenbîrî bî. Nînan teberê welatî de rojname, kovarî pirtûkî vetî. Avêşiyena zone kurdan de karê de bi qedr kerd. Zafêriye kurdan ewro zonê xo qese keno. Êwê ke nêzanene jî musenê û musenê jûbînî.

1988 de nêzdiyê 70-80 hazar peşmergeh derbazê Kurdistanê corî (Tirkiye) bî. Wunciya 1991 nêzdiye 500 hazar kurdê cêrî derbazê corî bî. Na derbazbiyene de kurdan jûbînî nas kerd. Hetkariya jûbînî kerd, zonê jûbînî ra fam kerd. Verhukmê ke hetanî nika bî, yan bî şenik yan jî werte ra dariyay we.

Parçê Kurdistanî zê verî jûbînî ra ciya niye. Hereketê kurdan parçan perîne de esto, tesîrê xo şarê ucay ser ro zaf o.


Şero ke Kurdistan de berdewam keno, bî sebebê welat terkayene. Xêlê kurdî amê metropolanê Tirkiye, Ewropa, Amerika û hetanî Avustralya. Nê Kurdan naca înstîtûsiyonê xo ava kerdî.

Her çîqa ke radonê Eriwanî, radonê PDK yan jî organîzasyonanê bînan jî bî, na ware de jî avêşiyene wunciya nê seran de biye.

Kurdan avêşiyena komunîkasyonî rind xebebnê. Ewro kurdî telefon, vîdeo, faks, hetanî telefonê satelîte jî ebi kar anê.

Kurdê parçanê Kurdistanî pêro MED-TV de niya danê. Zaravanê jûbînî kila-manê jûbînî, edet û toranê jûbînî şinasnenê.

Mesela kurdan, problemê kurdan ewro terîtoriyal niya. Ewropa ra hetanî Amerika, Avustralya re hetanî Rusya kurdî ênê qesekerdene. Yanê çiyê ke hetanî nika destê monopolê dewlete de bî, yanê mektebî eskeriye/artêşe û radyo-televîzyon ewro her çîqa ke dewleta xo çîna jî destê kurdan de estê. Na avêşiyene dîroka kurdan de demê (moment) de zaf rind de ca gureto. Bêguman na avêşiyene, nê çî pêro qomê kurdan ser ro kultur û hereketê dînan ser ro, rolê de pozîtîf kay keno.



Dizê ne diz

xwe kir, hundirê wî bizdiya. Tirsek ket laşê wî, canê wî lerizî. Wî bi zalimtiya polisên tirk dizanibû. Heger li ber çavên wî bi keça wî îşkenceyê bikin, dê ew çawan dayax bike, dê çawa li ber xwe bide. Îsmail di nav neçariyê de bû; ketibû nav du agiran. Di cihekî de keça wî, di cihekî de qebûlkirina dizîtiyê.

Polîsan dest pê kirin, bi keça Îsmail îşkence kirin. Li ber çavên Îsmail, li keçikê îşkence dikirin. Polîs ji Îsmail re got:

– An dê tu dizîtiyê qebûl bikî û an jî em dê îşkenceyê berdewam bikin.

Îsmail got:

– Bisekinin. Ew bêguneh e. Tu sûceki wê tune ye. Pê îşkenceyê mekin. Madem ku di çavê we de ez diz im, bi min îşkenceyê bikin.

Polîsan îşkenceya ku bi keça Îsmail dikir, berdewam kirin. Polîsekî cil û libasê keçikê qetandin; keçik tazî ma. Îsmail got:

– Tenê dizîti çî ye, hûn dixwazin ez mîrkûjiyê jî qebûl bikim, hema bibêjin min sed mîr, sed asker û polîs kuştine.

Li ser van gotinên Îsmail, polîsan dest ji îşkenceyê berdan, ewil çûn îfadeyek ku berê hatibû amadekirin anîn, bi Îsmail dane îmzekirin û paşê keça wî berdan.

Îsmail derxistin dadgehê. Di dadgehê de ew tewqîf kirin û şandin hepisxaneyê.

LOKMAN POLAT

Îsmail necarî dikir. Der û cîranan, nas û dostê wî jê re digot: “Îsmail Necar.” Îsmail hetanî ku televîzyona kurdî dest bi weşana xwe kir, qet televîzyon nestandibû. Jixwe jina wî tirkî nizanibû, wan di nav malê de tim bi kurdî xeber dida. Îsmail jî qet nedixwest ku li televîzyonên tirkan temaşê bike. Kurê wî û keça wî diçûn dibistanê û zimanê tirkî zanibûn. Wan çend caran ji bavê xwe re gotibû: “ji me re televîzyonê bistîne, em li filman temaşê bikin.” Lê, Îsmail gotibû:

– Na! Ez nastînim. Heger hûn dixwazin li filman temaşê bikin carinan herin sînemayê.

Piştî ku televîzyona kurdî MED-TV’yê dest bi weşanê kir, jina

Îsmail jê re got:

– Divê tu ji me re televîzyonê bistîni. Min di mala cîranan de li televîzyona kurdî seyr kir, gelekî xweş bû.

Îsmail:

– Baş e. Ez dê bistînim.

Di nav heftiyê de Îsmail çend caran çû dikanan, geriya ku ji xwe re televîzyoneke erzan bibîne û bistîne. Lê, televîzyon gelek biha bûn. Hevalekî Îsmail jê re gote ku di ‘Sûka Kevn’ de dikanek heye, televîzyonên kevn ên ku hatine bi kar anîn, difroşe û gelek jî erzan dide. Îsmail çû ji wê dikanê ji xwe re televîzyonek kir. Erzan bû. Televîzyonê anî malê.

Du roj derbas bûn. Polîs hatin mala Îsmail û ew girtin binçav. Jê re gotin: “

tu diz î, dizê televîzyonê yî. Te televîzyon dizî ye.” Û bi Îsmail îşkence kirin. Lê Îsmail dizîti qebûl nekir. Wî ji wan re digot:

– Divê tu dizîtiya xwe qebûl bikî. Em zanin tu diz nîn î, lê divê tu dizîtiyê qebûl bikî. Heger tu qebûl nekî, emê biçin keça te jî bigirin, bînin vir û tecawizê wê bikin.

Îsmail dîsan jî qebûl nekir ku wî dizîti kiriye. Ji wan re got:

– Ez diz nîn im. Ez heysiyet û şerefa xwe ji bo televîzyonekê naşkinim. Bila ez bimirim, lê navê min diz dernekeve. Hûn bi darê zorê nikarin nedizekî bikin diz.

Roja din, polîs çûn keça Îsmail girtin û anîn. Îsmail gava ku çav bi keça

Dijminekî rast û mîr çêtir e ji dostekî bêkêr

Li ser kuçekî rûniştibû. Kertekê din lê çêkir. Kert jimartin, kêfxweş bû: “Panzdeh roj derbas bûn, ma panzdeh roj. Roja di pêşî de ez tîr rakevim. Paşê ez xwe ji bayê zivistanê re amade bikim, tevdira zar û zêçan bibînim.

Serê xwe rakir ku pêz winda ye. Li çongên xwe da. Çoyê xwe yê şivaniyê girt û bi bez meşiya. Wekî ku aşiteke berfê di ser de ketibe, bêhna wî teng bûbû; wekî celebên ku keriyê pêz winda bikin, xwe li keloşkan, li bilindiyên hildigirin.

Her çiqaş diçû çirûskeke cixarê li pêşiyê alavî dida. Bang kir... Tu deng û bersiv nedibihîst, xwe gihand çiyê. Nihêrî ku pez di mexelê de ye. Ji bo wî çî şeveke bi teşqele bû. Derdorê pêz tijî zevî û erdê ajotî bûn, lê yek pez belav nebûbû.

Dengekî zelal û bişahî ji gundê jêrîn dihat. Ji dîlanan pir hez dikir. Nola zarokekî şad bû. Ji xwe re got:

– Ger hebe bi pêz tiştê nabe, bi Yêzdan ezê herim dîlanê.

Dizanibû ku li derdora wî hinekên din jî hene. Li aliyekî jî, ji bo ku deng biçê wan bi dengê bilind û stûr wiha got: “Pêzino, ez va ye çûm, dîsa jî wekî niha bin ha!”

Çû dîlanê. Bêxem ket dîlanê. Cilqo dipelptî. Hatina şivên li wî bû rik, “Wî keriyê pêz çawa bêxwedî hiştiye?”, gote di dilê xwe de.

Şivan dageriya, çoyê xwe da ser stûyê xwe û wiha got: “Divê ez deh kesên din biavêjim te. Ev dîlan hêjayî deh şivanan bû.”

Dotira rojê, bêrî nivro hatin. Dest bi xwarinê kir. Bêrivanek bi ser ket (qerf kirin):

– Dîsa kêf tîrîngaz e, ne wisan? Ev kêfa bira û xwengan bi te xistine. Ne were be rûçikê te yê mîna çermê gamêşan tu car nakene!”

Qehirî û dest bi çêran kir:

– Qîza kerê qol! Tu çima êşkere qîsan dikî. Pariyekî biaqil be!

Hê xwarin dixwar, leşkeran derdora wî girtin. Bi pehî û kulman lê dan. Çavên serbaz li çoyê wî ket. Diqîriya:

– Nedir ulan, bu da bi teknik midir? (Ev çî ye kuro, ev jî rêbaziyeke e?)

Ferman da leşkeran, şivan girtin û çûn. Di hundir de qîra (bela) xwe di wî didan:

– Söyle bu kesiklerin anlamını, söylemesen ölürsün. Senin koyunların insan mı ki kendi başlarına bırakabiliyorsun? Sayı saymasını bilmiyor musun, ilk çağda mı yaşıyorsun? (Wateya wan kerteyan bibêje, ku tu nebêjî tuyê warî

kuştin. Ma keriyê pêz mirov in tu pêz bêxwedî dihêlî? Ma qey tu jimartinê nizanî, tu di çaxê pêşîn de diji?)

Diqehirî, lê peyvên xwe nerm gêlêr dikir:

– Qomitanim edettir, edet û pir jî xoştir. Sebîrdîr, ma bu de jî ne çek û tîvingdir.

Bi tenê mabû. Bi azwerî û diltenikî ji xwe re digot:

– Ê te çî belengazo. Ma tu nizanî bijmêrî. Edetên şivanan ji te re çî! Ma van malmîratên romîyan jî qarîşî her tiştî mirovan dibin. Ne dikarin bi hevalan, mîraniya xwe di serê yê wî wek min de diteqînin. Wa wana pêçiyên xwe bêhn kirin. Ji ku deverê dizanin ku min do êvarê pêz bi tenê hiştiye. Wey çilqo, wey...! Rast e rast e, ‘Dijminekî rast û mîr çêtir e ji dostekî bêkêr’.

JÊHAT GIMGIM

Sirgûnên li benda vegeerê

Ez bawerî û hevî dikim ku, xwendevanên serbixwe bi vê dramê re eleqedar bibin û vê mînakê ji gel re pêşkêş bikin, êdî ev dijminatîya ku bi destê derewînan hatiye çêkirin, wê karibe ji holê rabe û bibêjin: Bes e êdî ji vê bêmantiqiyê re.

Weşanxaneya Belgeyê dîsa berhemeke heja bi navê "Andonia" çap kir û pêşkêşî xwendevanan kir. Ev pirtûk bi destê nivîskar Ertuğrul Aladağ hatiye nivîsandin. Bi rastî dema ku behsa koçkirina etnisîteyan Anatoliyayê tê kirin, mirov ewqas bala xwe nikare bide ser bûyerê. Yanê ew pêvajoya baş nayê fêmkirin û mirov nikare zindîtiya wê demê bîne ber çavên xwe.

Her çiqas em ji wî aliyê ve hin tiştan bizanibin jî, ev zanîn têr nake. Ev kêmasî ancax bi destê paşmayîyan, bi çavdêriyên wan dikare temam bibe.

Andonia, îcar berhemeke wisa ye. Di pirtûkê de nîha problemên gelên me yên der barê dîrokê de, bi teyayî bi destên dîrokanên derewî û siyasethanên nîjadperest hatiye nivîsîn. Ji ber ku rastiya bûyeran ne-nivîsîne û her tim derew ji xwe re wekî kar zanîne. Lewma hemû gelên Tirkîyeyê (Anatoliyayê) îro ku li ser piya ne, divê bê zanîn ku ew li rastiya xwe digerin. Ta ku dilê wan xweş bibe.

Di dema avakirina komara tirk de, danûstandina rûmên Tirkîyeyê û tirkên Yewnanistanê çêkirin. Ew bûyer, jixwe bi serê xwe tenê drameke mezin e. Ev dijminatîya ku vê gavê di nava gelên tirk û yewnanî de heye, ev ji wan rojan mane; û taybetî bi destên polîtîk-

vanên her du dewletan hatiye çêkirin. Rastî ew e ku, gel tiştêkî ji hev û din naxwazin; ew tenê li hevîya aştiyê ne û bi hev re bi dil û can in.


Drama gelên ku ji herêma Mûxlayê koç kirine, di vî warî de ne ya yekemîn e. Beriya wan, li Anatoliyayê qetilkirin û pişt re jî tehçira (koçkirina) gelên fileh di dîrokê de kifş e.

Dewleta Yewnanistanê, ji vê danûstandinê kêfxweş bûye, yanê ew jî lê xebitîne ku etnisîteyan ji holê rakin. Wan jî nîjadperestiya xwe nîşan daye. Di nava wan her du mantiqan de rûmên koçber gelek sal wekî gelên bindest li Yewnanistanê hatine qebûlkirin û gelek heqaret dîtine.

Girêdayibûna wan ji welat re, ewqas heye ku bi rastî nayê tesawirkirin. Çûne kîjan cihî, li wir navên bajar û gundên xwe yên berê dane ser navên sûk û rîyan. Lê belê di pirtûkê de tê fêmkirin ku, ew hîn jî bi hesreta "welatê xwe" ne.

Ez bawerî û hevî dikim ku, xwendevanên serbixwe bi vê dramê re eleqedar bibin û vê mînakê ji gel re pêşkêş bikin, êdî ev dijminatîya ku bi destê derewînan hatiye çêkirin, wê karibe ji holê rabe û bibêjin: Bes e êdî ji vê bêmantiqiyê re.

EZNAS MAYA




Ertuğrul Aladağ

Weşanên Belgeyê, Divanyolu Cad. Işık Sok. Ali Faik İshani, No: 5/6 Sultanahmet/ İst.

Cem Boyner heyf bû xwe xerc kir...

A. MELİK FIRAT



Di destpêkê de Cem Boyner û çend hevalên wî li Enqereyê hatin ba min, em peyivîn. Min jê re ev gotin, gotibûn:

Tehsîla te heye, pereyên te jî hene, heke tu ji bo hobî û zewqê dikevî siyasê, nekevê, zirar wê ji karê bêhtir be. Me hinek kitêb xwendine, tê diyarkirin ku dema yek pir dewlemend dibe, çî zewqa ku xwestibe bi dest xistibe; di dawiyê de şaşgirekê dide ber serê xwe û xwe dikuje, ji ber ku êdî tiştêkî ku bixwazê nemaye... Ez zen dikim ku tu ne ji wan kesên têrxwar û tolaz î, ez bawer dikim ku tu ne ji wan î... Eger ku tu zehmetkêş î, dixwazî ji bo mîletê xwe bixebitî, dixwazî demokrasî were; ev xizmeteke pir mezin e...

Cara duyemîn ku hate ba min, min jê re ev got: îro ew kesên ku siyasê dikin, pir derewan dikin, lazim e ku tu siyaseteke nû, di siyasê de riyeke nû deynî. Yanê; soz nede û nebêje, ez dê rê çêkim, pir çêkim û nizanîm çî... Mîlet ji derewan têr bûye, êdî kes guh nade derewan; ew dizanin ku siyasê fen û xapandin e, derew û dalavêre ye... Ji ber vê jî, divê tu tiştên wisa bibêjî ku bikeve serê însanan. Gerek e tu guherînan bidî pêşîya xwe:

Mîna welatên Rojava (xerb) ku demokrasî li ser wan hikûmran e, bila ev qaîde were vî welatî jî... Dewlet gerek e ji xwe re tu îdeolojiyê nehebîne, dewleta îdeolojîk çên-

abe; divê dewlet bibe hakem dewlet, îdeolojî jî bo ferdan lazim e, ne ji bo dewletan... Îro di îdeolojiya fermî de du esasên muhîm hene; yek neteweperwerî ye, ku li Tirkîyeyê wekî nîjadperestî tê bikaranîn, a dîn jî laîsizm e, ku ev jî ne bi awayê Xerbê ye, ji xwe re kirina mîna dîn, û mudaxeleya hemû kes û bawerîya hemû kesên dikin; dibêjin "İllah hûn dê wiha hereket bikin!" Ev xelet e... Ev kesên ku laîsizmê dihebînin, bila ji xwe re partî saz bikin, bila ev serbest be... Lê dewlet bila xwediyê îdeolojiya laîkiyê nebe, bila dewlet nîjadperest jî nebe; ev du xeletiyên mezin in. Wekî demokrasîyê ewrûpiyan, bila her fikir şîn bibe û li her derê belav bibe, bila temamî tebeqeyên civakê bikaribin xwe temsîl bikin. Zîra, îdeolojî dewletan pûç dike...

Îro fikreke ku van daxwazan ji xwe re bike hedef û armanc, wê di nav gel de cih bigire, wê alîkarên xwe peyda bike.. Ew kesên ku dixwazin bi rengê îslamî bijî jî, wê alîkariyê bikin. Hinek partî derdikevin, dibêjin "em partiya îslamî ne", lê ew jî derewan dikin; ew jî mîna laîkan in. Heke hûn daxwaza mafên kesên belengaz û mazlûm bikin, hûnê serfiraz bibin, heke na, hûn serfiraziyeke bidest naxin...

Piştî van gotinên min, bi "zehf rind e" bersiva min dabû.

Cara sêyemîn ku me xeber da, min jê re wiha gotibû:

Hinek tişt hatine guhên min; ew partiyan ku di bin emrê loncaya masonan de bixebitin, dibine alet; li ku derê çawa bixwazin, te bi wî şêklî dirîje dikin, sewq û îdare dikin. Li ku derê bixwazin jî te xera dikin... Ji min re got "Na tiştêkî wer tune ye" lê min tê deranî ku rast e... Yanê sebebê nemûwefeqeta Cem Boyner ew e ku kete bin emrê dirîjeya loncaya masonan. Min

berê got, ku tu bitirsî nekeve siyasê, gotibû na, ez natirsim. Lê di dema hilbijartinan de ji tirsan bi HADEP'ê re nekete îtîfaqê... Heke bi HADEP'ê re îtîfaq çêbikira, mimkun bû ku ji sedî deh zêdetir ray bîstandana. Çû bi xebere loncaya masonan kir, ew loncaya ku dewletê bi serê xwe îdare dike..


Di siyaseta Tirkîyeyê de, hebûna kesên mîna Cem Boyner ku zêde bin, ji bo vî welatî baş e; hewayeke nû tînin holê. Ev tîpên klasîk ku rejîma kemalîstan ew derxistîne meydanê û fikr û ramanên wan ji şablona kemalîstan dernakevin, vî welatî nikarin yek santîmekê bi pêş ve bidin, ew welêt tim bi paş ve didin...

Me tecrûbeyên xwe ji Cem Boyner re gotin; eger pê îtîbar bikira ji bo wî jî, ji bo welat jî baş dibû. Lê ew çû ket bin tesîra lonceyan masonan; ew xapandin û çavên wî tirsandin. Li dora wî kesên ku cesaret bidinê jî tunebûn. Piştî ku partiya xwe saz kir, êdî hew li min geriya... Di dema hilbijartinan de, min xwest ku pê re bipeyivim, lê ew ji min reviya; bi Ahmet Türk, Sırrı Sakık û Şerafettin Elçi re peyivî, lê ji min reviya... Heke nerevîbûya, ji bo ku îtîfaq di navbera wan û HADEP'ê de çêbûya minê xebat bikira. Ku îtîfaq çêbûya wê ji sedî sed baraj derbas bikirana... Hem ji MGK'yê tirsîya, hem jî loncaya masonan mecal nedanê. Hat di wezîyeteke xerab da sekinî, ez texmîn nakim ku wê bikaribe partiya xwe êdî bi vî rengî bide meşandin... Ku di siyaseta xwe de guherîneke çêbike, belkî bikaribe bimeşe...

Ez dibêjim, Cem Boyner xortekî baş bû, heyf bû, xwe heba kir, xwe xerc kir.

**Nivîskarê me birêz Abdûlmelik Firat ev makaleya xwe beriya ku rêveberên YDH'yê istîfa bikin, ji me re rê kiribû.*

Baca gundê Helexê û peyayê sivik



Rojekê tahsîldar diçe gundê Helexê ku baca salê berhev bike. Gundî lava dîkin, dibêjin: Îro destê me teng e, dirav di destê me de nîn in." Soz didinê ku roja duşemê dê bacê kom bikin û bi peyakî sivik bi lez bişînin.

Pêşî peyayê sivik amade dîkin, ango kîvroşkê digirin û girê didin. Roja duşemê ji nav gund bacê berhev dîkin. Diravan dixin kîsekî, bi stûyê kîvroşkê ve dadişînin. Jê re dibêjin: "Tu vê bacê bibe Midyadê, radestî tahsîldar bike. Eseh, eseh ji destê te û yê tahsîldar."

Kîvroşkê berdidin ser rîya Midyadê, lê kîvroşk bi çolê de direve. Hinekina ji wan dibêjin: "Mîna ku peyayê me rîya Midyadê nas nake?" Yê aqilmend jî dibêjin: "Ma hûn debeng in? Ew rîya Midyadê xweş dinase, jîr û zana ye. Me jê re gotibû ji destê te û yê tahsîldar. Ew jî, ji bo neyê şêlandin xwe ji ser diz û keleşan didê alî."

Di ser wext û civana wan re deh roj derbas dibin. Tu deng û agahî ji wan naye; yê tahsîldar radibe diçe gund, doza baca ku bi deyn li wan mabû û peymanê heft rojan ku dabûnê, li wan dike. Ew jî dibêjin: "Me peymanê xwe bi cih aniye, roja duşema rabirdû ji te re hinartiye. Teqez ji gihîştîye destê te."

Tahsîldar jî rûspiyên gund heyetekê bi xwe re dibê Midyadê, dadgehê dîkin dadger. Helexîyan îdia kirin ku baca xwe şan-

dine destê tahsîldar, lê tahsîldar çavsoyîyê li wan dike û standina bacê dubare dike. Dadger dipirse: "Ew mirovê ku we bac pê re hinartibû, hûn dikarin şanî min bidin?"

Dibêjin: "Na. Me bi peyayê sivik hinartibû."

Dadger: "Kuro peyayê sivik kî ye?"

Heyeta Helexê: "Te dît bê çawa xwe dixişîmîne; wekî ku peyayê sivik nas nake. Peyayê sivik kîvroşk e. Me baca xwe bi kîvroşkê re hinartibû."

Dadger: "Niha we baca xwe bi kîvroşkê re hinart?" Dibêjin: "Erê."

Dadger jî xwe re "Gelo ev debeng in, an jî tinazên xwe bi min dîkin" dibêje. Dû re wan azmûn dike, diceribîne. Ferman dide dergevan dibêje: "Bêjîngêk mewijên reş û hinek kêzikên reş tevî hev bike, ji min re werîne."

Dergevan jê re tîne. Li ser maseyê, li ber wan vala dike, ka kêzik û mewijan ji hev nas dîkin an na. Ji wan re dibêje: "Fermo mewijan bixwin, gelî mêvanên delal."

Dema mewij vala kirin, kêzik ji nav mewijan revîn. Helexîyan ji hev re gotin: "Pêşî bi dû siwaran bikevin, dû re li peyayan veşerin."

Dadger dinihêre ku debeng in, dibêje: "Rast e, we baca xwe hinartiye" û wan dibexşîne.

BERHEVKAR: Î. OMERÎ

XELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (16) XAÇEPIRSA


Lêkolîn	F	P	T	A	U	L	Sotayek
Malavay	M	A	Z	V	A	P	A
Sembola	R	E	C	E	M	P	E
Pasgirek	E	K	A	O	T	V	A
Katibî	B	O	R	J	E	K	A
Derav	K	D	L	N	E	W	E
Erastir	L	T	R	R	E	Z	
Hênk	K	D	A	S	A	T	
Dilana	T	A	I	S	O	T	
D	K	E	R	E	S	T	

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsê (14)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 10 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 16'an kasete **Koma Çiya** "Dilana Bê Sînor" e.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîstin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 14'an pirtûka **Firat Cewerî** "Kevoka Spî" qezenc kirine: **Îbrahim Altıntaş / Batman**, **Mehmet Önder / Adana**, **Mahfuza Yıldız / Edene**, **Cemil Bilgiç / Edirne**, **İlo Neper / Üsküdar**, **Edip Seynek / Esenler**, **Selman Timur / Bartın**, **Dilana Selçuk / İskenderun**, **M. Ali Erden / Sêrt**, **Mîqdat Kaya / Mersîn**

Weje vanê di wêne de	Zîrek	Pereyê Tirk	Oksijen	Pêşeroj	Nijadek
Sinagog	Modern	Pend	Bi inglîzî kêmûn	Sêwe	
				Çima	
				Şilekî	5
Mileki kurdan li Iranê Tûj	1		Îman		2
			Êm. pût		
		Notayek	Bi mirin		
			Aks		
Mesalok					
Di erebî de herfek	3			Herfek	Tipek
		Giyayek			
		Yan	4		
Rihetî	Li Qersê xerabeyek	Notayek		Lnt	
		Sembola îrîdyûmê			
			Qertafeke neyiniyê		
			Paşgirek		
Paşgirek		Notayek		Herfek	
Sewda					
6			Kurt		

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6



Şengê û Pengê bi rastiya xwe hesiyane

Dema ku ez zarok bûm, keçikek li gundê me hebû; pir zanîbû çirokan bibêje. Êvarê em zarok li mala wê dicivyan û ji me re dest bi çirokan dikir. Yek ji wan çirokan gelekî balkêş e, ezê bibêjim.

Ez guman dikim gelek ji we vê çirokê dizanin, navê wê heger ez ne şaş bim çiroka "Şengê û Pengê" bû, wiha bû:

Bizinek û du karikên wê yên pir xweşik hebûn, navê yekê ji wan Şengê bû û ya din jî Pengê bû. Diya wan her sibeh derdiket derveyî malê, ji xwe re diçêriya ku ji her du zarokên xwe re şîr çêke.

Rojekê bizinê pêjna gurekî li dora malê kiribû. Bizinê karikên xwe dixist hundir, derf li wan digirt û ev tembî li wan dikir:

– Hûnê derf ji tu kesî re venekin, wexta ku ez werim ezê li derf bixim û ezê wiha bibibêjim: Şenga min, Penga min diya we hat ji zozanan/ şîr xistiye hebanan (guhana)/ ji diya xwe re derf vekin.

Wexta ku bizin vê yekê dibêje gur jî dibihîze. Piştî derketina bizinê bi texnekî gur tê ber derf, li derf dide û wiha dibêje:

– Şenga min, Penga min diya we hat ji zozanan/ şîr xistiye hebanan/ derf ji diya xwe re vekin.

Pengê radibe ku derf veke, Şengê dibêje: – Bise Pengê, derf veneke. Ev deng ne wekî yê diya me ye.

Şengê û Pengê derf venekirin, gotin: – Heta tu destê xwe di bin derf re şanî me nedî, em derf venakin.

Gur ew pençeyên xwe yên bi xwîn û qirêjî di bin derf re dirêj dike û şanî wan dide.

Xwe bigire hindik maye wê diya me jî bê û tevî bi hezaran keç û xortên xwe. Bi keleşên xwe zikê te biqelêşin, wê tola gelek Şeng û Pengan ji te hildin.

Şengê û Pengê dinêrin ku ev dest ne yên diya wan e, derf venakin. Lê gur hey li derf dide...

Ez dirêj nakim, di dawiyê de bizin digihê ser gur, stroyên xwe dike zikê gur û wî dike û Şengê û Pengê ji devê gur xelas dike.

Mebesta min ne ew e ku ez ji mindalan re çirokan bibêjim, min ev li ser banga Serokwezîra KT'yê ya berê Tansu Çilerê got,

ser me basqîya (pêkufî) wê jî tune ye. Hûn rihet nasekinin, ji ber vê yekê jî, dewlet li ser we basqiyê dike. Ez rihet im, kêfa min di cih de ye, zikê min tê e û ez jî muhtacî tu kesî nîn im. Hûn ji min re çî dibêjin bibêjin, ez ne dibim welatparêz û ne jî şoreşger.

Saliho her tim bi vî rengî heval derdixistin valahiyê û tu tişt nediket mejiyê wî. Rojekê, heval dîsa çûn mala Saliho. Saliho, ew li pêşiya derf, li ser piya keremî hundir kirin. Heval rûniştin û Saliho dest bi peyva xwe kir:

–Heval, heval ewqas we ji min re got û min qet fêm nekir. Lanet bê serê min! Hûn min bibexşin. Ji vê demê û şûn de hûn çî bibêjin ezê wisa bikim. Pêwist e ez bibim şoreşger. Hişê min hatin serê min.

Heval şaş bûn. Ji Saliho pirs kirin sedema vê guherînê:

–Saliho çî bûye ji te? Berê ewqas me ji

ku seyda A. Durçe navê wê kiriye Zeyneba Zer. Ew ji gerilayan re dibêje: “Werin ez diya we me, ji vê dozê vegezin, werin ez we hembêz bikim, ez li ser we diêşim û ji bo we hêstiran dirêjînim.”

Erê Zeyneba Zer, tu jî wekî wî gurê devbixwîn, dixwazî ku me bixapînî. Na na em jî wekî Şengê û Pengê derf ji te re-venakin. Ji ber ku ew pençeyên te yên bi xwîn û qirêjî, ji zû ve me ditiye.

Xwe bigire hindik maye wê diya me jî bê û tevî bi hezaran keç û xortên xwe. Bi keleşên xwe zikê te biqelêşin, wê tola gelek Şeng û Pengan ji te hildin.

Na tu ne dayika me yî. Dayikên wilo me navên, dayikên ku zarokên xwe dikujin, xwîna wan vedixwin, li ser xwîna wan dijîn.

Beriya te me necamêr dîtin, digotin “Ez bavê we me”, lê bê çawa tu dêmarî derketî, ew jî zirbav derketibû.

Êdî em xweş pev hesiyane; hûn dizanin ku em ne mindalên we ne û em jî dizanin ku hûn ji me re, ne dê û bav in.

Me dê û bavên xwe dîtine, vêga em di hembêza dayika xwe de ne.

REMEZANÊ HÛRÎ

te re digot, te dîsa qebûl nedikir. Çi bû ji te ku tu dixwazî bibî şoreşger?

Saliho tiştên ku hatine serê, yeko yeko gotin:

–Heval hûn dizanin, ez di însaetan de dişixulim. Me karê xwe dikir, patronê me hat. Jinikeke sosyetîk jî pê re bû, bi Mercedesê hatibûn. Patron û jina wî, ji nava texsiyê derketin û hatin cem me. Di hembêza jina patronê me de fînoyek (kûçik) jî hebû. Fîno ket erdê û reviya. Min jî ew girt û bir ji jina patron re. Min fîno da jina patron. Wê jî şemaqek li min xist û got:

–Çima tu wan destên xwe yên gemarî li kûçika min dixî?

Ew şemaq zehf li zora min çû. Tiştên ku we beê bi min re gotibûn, hatin bîra min. Min baş fêm kir ku mirovê bi namûs, vê zilmê qebûl neke. Heke hûn qebûl bikin û min bibexşin, dixwazim ez jî bi we re bim.

LOKMAN BABAT

WELAT

Rojnâmeya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tjç. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
293 53 19 – 251 90 13

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
• Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÛNERÎTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat
Suriye:

Jan Dost

Berlin:

Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli
49-871-670884

Atîna:

Ferhan Zêbarî
30-13634905

Bruksel:

Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm

Robin Rewşen
46-8-7510564

Badenwürttemberg

A. Rahim Ayaz
49 75 45 91 10 42

Bi şemaqekê welatparêzî

Kurdekî bi navê Saliho, li metro-polên Tirkiyeyê jiyana xwe dom dika û li însaetan dişuxile. Dê, bav, jin û zarokên Saliho hemû welatparêz in. Ê di wê malê de tenê Saliho ne welatparêz e. Hevalan her dem bi wî re dipeyvîn. Dikin nakin nabe welatparêz û wiha dibêje:

–Dewlet tiştêkî nerast li me nekiriye û li

Li Îzmîrê aramî ji kurdan dûr e



Li Kurdistanê, gundî bi tirs û xofa cerdevan û tîman radibûn û rûdiniştin; zarokên wan bi vê tirsê ditemirîn. Niha jî bi tirs û xofa polîsan jiyane didomînin. Her dem dikevin heps û binçavan. Mînîbusên polîsan li taxên kurdan çira-fîtan diavêjin. Li metropolên tirkî tenduristî û jiyana kurdan tiştêkî pir dûrî hev in, ji ber ku xwarinekê wekî ya însanan naxwin; av û elektrîka wan bi destê belediyeyê tê birîn; nexweşek hebe nikare here doktor û ji bo îlacan jî pere tune ye.

Gava ku mirov diçe nava semt û taxên Îzmîrê yên ku kurd lê dijîn, nakokiyek xuya dibe. Li hêlekê bi çend tûxla û pîrketan kajikên mîna kolîtan (gecekonda) ji aliyê kurdan hatine avakirin, li hêla din jî apartmanên ku ji aliyê dewlemendan ve hatine avakirin. Kesên di apartmanan de dijîn, gava ku xaniyên kolîtvanan tê xerakirin ji aliyê belediyê ve, ew jî lê difericin û qet dengên xwe dernaxin.

Li Îzmîrê Semta Adatepeyê bi taybetî malê kurdan û kedkarên tirk nêzîkî 100 xanî ji aliyê Belediyeya Îzmîrê ve bi fermana Burhan Özfatura (Serokê Belediyeyê) ve hate xerakirin.

Me seriyek li Semta Şemîkler xist. Em çî bibînin, wekî gundên ku jî aliyê KT'ê hatine xerakirin li Kurdistanê, me li Îzmîrê jî dît. Li nava Şemîklerê pîrek û zarok li me vehewiyan. Zilam hemû çûne kar, da ku êvarî du nanan bîne malê.

Meta Sêbê (Sêbê Yüksel, 55) pîr-sên me bersivandin:

– Em hemû yên li vê kuçê dijîn ji Mêrdînê, ji navçeya Stewrê ne. Navê gundê me Dengiya ye. Nêzîkî 350 malî bû.

Du sal berê em hatin vê derê. Dewletê gundê me şewitand. Cerdevan û tîmên taybet hatin gotin: 'Hûn xwarinê didin PKK'ê' û zêde tişt negotin,

em ji nava gund derxistin û malên me şewitandin.

Meta Sêbê çavên xwe digire û devê xwe vedike:

– Niha li vê derê em demana (kirê) xanî 3 milyon didin. Pêşî me ji xwe re kolîtek lê kiribû, belediyeyê hat xera kir. Du çavîyên xanî hene, 8 kes lê dijîn. Mêvanekî me tê, em du heb li nav livînekê radikevin.

Daşra (tuvalet) me ji derve ye; mirov fedî dike here daşrayê. Deriyê wê bi telîs me girtiye. Baran dibare, em di bin de dimînin, alavê me çiqas bi ber avê diçe. Çima ku taxa kurdan e, kes rûçikê dewletê nabîne. Gava tèn heqê av û elektrîkê, em wan dibînin.

Zilam hemû erebeyên ku bi destan tene defdan digerin. Xiyar, firingî, îsot li gorî demsalê zebeş, petêx û hwd. difiroşin. Zarokên xwe naşinin dibistanê, ji ber mesrefa giran. Zarokên 10–12 salî solan boyax dikin. Kî êvarê çend nanan zêde bîne, ew wê roj şixuliye. Zeynep Öztürk (ji bo paşnavê wê Öztürk e "Ez çawa bikim. Ewê rojekê bibe Özkürd", dibêje. Li axaftina xwe wiha dom dike:

– Ez nema nanê firinên wan jî dixwim. Me ji xwe re tenûr xistiye erdê û em nanê xwe lê dixin. Bawerî bi wan û nanê wan jî nayê. Zilamê me jî karê însaetê dikin; fêkî difiroşin û zarok tatliyan digerin. Rewşa me ya

aborî ev e. Qet tiştêkî din tune.

Li Kurdistanê, gundî bi tirs û xofa cerdevan û tîman radibûn û rûdiniştin; zarokên wan bi vê tirsê ditemirîn. Niha jî bi tirs û xofa polîsan jiyane didomînin. Her dem dikevin heps û binçavan. Mînîbusên polîsan li taxên kurdan çira-fîtan diavêjin.

Em hebekî li Şemîklerê geriyan. Bêhemdî zilamek bi ber çavê me ket, kêfa wî gelek ji me re hat. Me xwe bi hev da naskirin. Navê wî Kazim Yüksel (50) bû. Wî jî ev tişt gotin ji me re:

– Polîsan girt ser taxa me. Ez û pîreka min, birin; 15 rojan binçavî û 9 mehan girtigeh. Di bin çav de îşkenceyên ku hemû kes zanin wekî, daleqandin (aşqî), avê cemidî, elektrîk, xeber û sixêf û hwd. bi serê min de anîn.

Li metropolên tirkî tenduristî û jiyana kurdan tiştêkî pir dûrî hev in, ji ber ku xwarinekê wekî ya însanan naxwin; av û elektrîka wan bi destê belediyeyê tê birîn; nexweşek hebe nikare here doktor û ji bo îlacan pere tune ye. Bi kurtayî zû zû teslimî mirinê dibin mirov. Melihe Süre li Îzmîrê li Taxa Yamanlarê Biçûk rûdine. Ew dibêje:

– Rûniştin jî çî rûniştin. Me bi lez û bez ji xwe re xaniyek lê kir, teman kir. Me lê nêrî polis û zabit û qêder, dozer hatin xera kirin. Ew çûn me dîsa

ava kir, îcar hatin elektrîka me birîn. Ez û polîsan, em pev çûn. Dû re 12 milyon cezayê pere ji me re hat. Me nedaye û em nadin. Ji ber ku tune ye.

Gotinên Muslumata Taşdemir jî hene:

– Nexweşên me dikevin razangeha nexweşxaneyan, pere tune ye em tabûrcî bikin. Bi halê xerab qerta şîn (yeşil kart) çêdikin. Yanê nexweşên me dibin mîna gerewan (rehîn).

Rewşa jiyana gelê kurd li metropolên Tirkiyeyê Stenbol, Îzmîr, Mersîn, Edene, Manîsa, Aydinê û li her derê wekî hev e.

Li hinek gundan patronê wan piçekî insan be, wan dixê axurê sewalan. Ew jî ku sewal (çêlek, mîh, bizin) hatibin firotin. Rêxa binê axurê diavêjin û qir û qafên xwe rêz dikin û rûdin. Ew çax jî, bi mişk û cilbûhan re şerê wan re dest pê dike. Wîçewîça mişkan nahêle kes rakeve. Carinan jî cilbuh di ser çavên zarokên wan derbas dibin û birîn dikin. Ji 50–60 însanî re daşrayek û serşokek. Rojê nîşek serê xwe dişon.

Niha kurd zivistanê jî diçin çiyê karê çandiniyê (ziraetê) û dikevin çiftlikên ku mirîşkan û conegayên dermale ji bo xelkê serjê bikin. Li vir jî rêx û zelqê diavêjin. Di van hemî şixulan de bêsigorta dixebitin.

FEREC KURÊŞIVAN